HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Gişti

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Dr. Birahm Mehmûd
Ebdilxaliq Sersam
Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Dr. Mihemed Ezîz Zaza
Ferde Cemîl Paşa
Foad Gemo

Derhênana Hunerî

Îsam Hecî Tahir

Çapa Eliktronî

N. Zaza

Naverok

Cenga ramiyar ; berdewame	SERGOTAR	126
ŞÊX ELÎ ÇI DIKE?	Lokman Polat	124
Nêrînek li ser kesayetiya Haco Axa	Demhat Hezexî	122
ÇANDA TIRSÊ û IMPERETORIYA XWÎNÊ	Pîr RUSTEM	120
Têkeliyên Kurd û ereb Sûrî Wek Nimûne	Xeyredîn murad	77

Çewaniya Firotina Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (12000) Dînar
Kesan (10000) Dînar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (6000) Dînar
Kesan (5000) Dînar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

sergotarê

Cenga ramiyarî berdewame

Ji dema ruxandina rijêma dictator li –(9 nîsana 2005)ê prosêsa ramiyarî li Îraqê bi diyartirîn destpêkir di seqayekî pir ji azadî û dûr ji tirsê û ji destpêkê diyar bû ko erk girane û rêka avakirina Îraqa nû dirêje nemaze ko rijêma ruxiyaî karê xwe yê wêrankirinê di heyama (30)salan bi cih anîbû û werara siruştiya civakî rawestandibû di biwarên abûrî û civakî û siyasî û rewşenbîrî û dewlet kirbû dewletek leşgerî û bi hemî şiyanên xwe hewla guhorîna demografî û neteweîy û ji bibirna miletan û heya guhorîna serûsîmayên siruşt û bajêran û deveran- ya diyar ko gelê Kurdistanê ji van hemî kiryar û zordariyan behra şêrî hebûye.

Wek tê zanîn ko bizava rizgariya kurdî û pêkhatîn siyasî yên gelê Kurdistanê rolê serekî hebûye di berhingariya diktatoriyetê bi rêkên leşgerî û siyasî û cemawerî û dîsan jî di şerê rizgarkirina Îraqê û piştre berev rolê xwe çûye di pirosêsa siyasî li Îraqê bi hemî şiyanên xwe û wesa jî destpêşxer bû di liber destdana pirojê Kurdistanê yê aştiyê mîna pirojê destûrê Îraqa fedral û pirojê destûrê herêma Kurdistanê ûrolê ji hejî di civata desthelata berwext li Bexdanê û dariştina yasa birêvebirina dewletê ko giringtirîn berhemê piştî rizgarkirinêye her wesa jî komeke bizav û çalakiyên milî û cemawerî li jêr navên yekîtiya niştîmanî û lêbûrînê û diyaloga demoqrat mina civata rewşenbîriya kurd û ereban ko bihtir ji 500 kesatiyên siyasî û

rewşenbîrî yên kurd û ereb li Hewlêra paytext amadebûn bi çavdêriya rêzdar Mesûd Barzanî û destpêşxeriya komela dostîniya kurd û ereban.

Heya niha jî nûnrên gelê Kurdistan li perlemana Îraqê li Bexdanê û di çarçûvê lîsta demoqrata Kurdistanê û li serokatiya komar û civata wezîran û hemî dam û dezgehên fedral û yên li herêma Kurdistanê jî ji serokatî û perleman û hukmet bi hemî hêza xwe hewl didin ko pirosêsa siyasî bi serkeftiyane bi dawî bênin bi rêka dan û standinê û diyalogê digel hemî pêkhatên Îraqê û bi giyanekîpolayî û dilekî pir hêz û dest neberdan ji pirsên çarenûsaz yên gelê Kurdistanê mîna fedraliyet û sînorîn herêmê û Kerkûk û nasnama Îraqê û şêweyê sîstemê fedral û paşeroja pêşmergan û pirsa lihev vekirna desthelatê û samanan ko ew bixwe bi erkên neteweyî û nîştîmanperwerî radibin û derbirînê ji hêvî û daxwazên gelê Kurdistanê dikin yê ko baweriya xwe daye wan; tiştê serinc rakêş ko kar û westiyana wan ne bi tenê jibo Kurdistanê ye belê jibo hemî Îraqê ye û bi taybetî di biwarê serwrî û sexwebûna Îraqê beramber derdora xwe ya maîtêker bi navê netweyî yan aynî yan mezhebî û xwe bigehênin destûrekî demoqrat û hevçerx ko mafê hemî pêkhatan biparêzê û mafên afretan bi çespênê û berev civakek sivîl ko belens di navbera desthelata navendî û ya herêman de hebê; lewra em dibêjin ko kurdan barê hemî Îraqiyan helgirtiye û lewra jî hêza herî pêşkeftîne beramber metrsiyên ko li ser pirosêsa demoqrat li welat û lewra jî kurd bûne gerentiya serekî di parastina yekîtiya Îraqê û pêşveçûna avabûna welat û ji ber van egeran jî em dibînin ko hêzên tîrorê û tariyê berê tîrên xwe dane gelê Kurdistanê û nûnerên wî û bizava wî ya siyasî û serokatiya Kurdistanê û hewlên peydakirina astengan û belavkirina pirbagendan li ser camên hidek setelaytan û berperên hind rojnaman bi armanca herfandina pirosêsêa demoqrat û guhorînê ya ko Îraq îro bûye nimûna wê li rojhelata navîn.

ŞÊX ELÎ ÇI DIKE?

Lokman Polat

Min di kovara tirkan ya hefteyî ”Nokta” de hevpeyvîna bi serokê PRS -Partîya Reform ya Surîyê –Ferîd N. Ghadry re xwend. Gelek keyfa min hat ku partîyeke ereb û serokê wê kesekî ereb di derbarê kurdên binxetê –başurê rojavayê Kurdistan- de ewqas gotinên baş dibêje û dîtinên pozîtîf pêşkêş dike. Ferîd N. Ghadry bi helwesteke vekirî piştgiriya doza kurd û çalakî û xwepêşandanên kurdan dike.

Ferîd N. Ghadry dibêje : ”Piştî kuştina Şêx Maşûq xwepêşandan û serîhildana kurdan pêk hat. Rejima Baas zilm û zordariyeke giran li ser kurdan pêk tîne. Kurd reaksîyonên xwe di kuçan de tînin zimên. Bi qasê ku ez dibînim kurd însanên bi qerar û bi hêz in. Hêvîya me ev e ku berxwedana wan ya demokratîk li ser gelê erebên Surîyê jî tesîr bike û li hemberê Baasê li temamê Surîyê serîhildan pêk bê. Qatîlê Şêx Maşûq desthilatdarîya Surîyê ye. Beşar Esad waadên ku daye naynê cih û reforman pêk naîne.” -Kovara Nokta hejmar : 1147-

Serokê SRP-ê di hevpeyvîna xwe de di derbarê kurdan de gotinên baş dibêje, zilma li ser kurdan tîne zimên û diyar dike ku Şêx Maşûq ji alî rejima Surîyê ve hatiye kuştin, lê çi heyf ku hinek kurd berevajê vê dibêjin û rûn li nanê rejima partîya Baas dikin. Dema min vê hevpeyvînê xwend beyanên PYD-a Apoyîyan û beyanên serok û birêvebirê ”Partîya Yekîtîyê” hate bîra min. Beyanên serokê partîya Yekîtîyê Îsmaîlê Emo û birêvebirê partîyê Şêx Elî şermezarîye.

Î. Emo û Şêx Elî beyanên nebaş dan û li hemberê xwepêşandanên ku ”Partîya Azadî ya Kurd” organîze kiribû, derketin û di serde jî gotin : ”Rejima Surîyê kurdan ji bo kurd in nakuje. Şêx Maşûq ji alî hukumeta Surîyê ve nehatîye kuştin.”

Hinek partî û rêxistinên kurdan ecêb in. Xwedêgiravî ew li dijê dagirkerîyê ne, lêbelê ji bo xwe bixin çavên birêvebirên dagirkeran û xwe bi dewleta dagirker baş bidin nîşandan çil teqle liser hev davêjin.

Ji xwe re livê ecêbê binêrin; şexsiyetekî kurd ê welatparêz bi xwînxarî tê qetilkirin, kurd têne kuştin û hinek partî û rêxistinên kurdan li dij kirina qirêj yên dewleta dagirker derdikevin, dewletê protesto dikin,

qirinên qirêj şermezar dikin, rûreşiya dewletê li pêşberê qamuya gştî ya cîhanê lanet dikin, ji bo wê xwepêşandanên girseyî amade dikin û hinek partîyên kurd yên din jî li dijê van tiştan derdikevin. Birêvebirê partîya Yekîtîyê Şêx Elî çima li dijê van çalakîyan derdikeve?

Dema Şêx Maşûq hate qetilkirin, divê Şêx Elî ala têkoşînê bilind bikira û ji dewleta dagirker a Surîyê re bigota : "We Şêxekî welatparêz şehîd kir, lê bi dehan Şêxên welatparêz yên kurd hene. Şêx maşûq bû şehîdê doza netewî, ew ne yê yekem e û ne yê dawî ye. Têkoşîna doza netewa kurd dê her bidoma heta ku gel azad bibe, welat rizgar bibe.Çêx Maşûq çû, waye Şêx Elî heye. " Lê, çi heyf ku Şêx Elî ala têkoşînê bilind nekir, helwesta teslîmbûnê û tirsonekîyê nîşan da û rûn li nanê dewleta dagirker a Surîyê kir.

Li başurê rojavayê Kurdistanê deh, panzeh partîyên kurd hene. Di esasê xwe de hemû jî partîyên azadîxwaz in, kurdperwer in. Partîya Yekîtîyê jî partîyeke welatparêz û azadîxwaz bû. Lê, ev helwesta wan ya niha qert layiqê misyona wan ya azadîxwazî û welatperwerîyê nîn e. PYD – Ev partîya Apoyîyan e û navê kurd jî lê tune. – li dijê çalakîyên kurdên binxetê derkeve, nexwaze ku li derveyê wan tevgereke alternatîf ya kurd bi hêz bibe û nexwaze ku "Partîya Azadî ya Kurd" çalakîyên xwepêşandanê organîze bike, mirov wan fêm dike. Rewşa PYD-ê diyar e. Lêbelê bi partîya Yekîtîyê – ya Xwedêgiravî demokrat- çi bûye? Qey ew jî bûne Apoyîyên şermok(!)....

Partîya Yekîtîya Demokrat a Kurd bi beyanên serokê wê Îsmaîlê Emo û birêvebirê wê Şêx Elî kete rewşeke şermezarîyê. Divê ew ji gelê kurd doza lêborînê bixwazin. Divê ew pesnê dîktatorê dagirker û dewleta xwînxwar nedin. Ew partîyeke kurd in û divê li doza kurdan xwedî derkevin, li hemberê dagirkerîyê têbikoşin.

Kurdên binxetê, anku kurdên Kurdistana başurê rojava ji hemû mafên xwe yên însanî –mirovahî-, demokratîk û netewî bêpar in. Bi salane ku bi sedhezaran kurdên wir ji nasnameya hevwelatî ya Surîyê bêpar in û dewleta dagirker a Surîyê wan kurdan tune dihesibîne. Ew zindîyên mirî ne, zindîyên tuneyî ne. Kurdên ku xwedî nasnameya hevwelatîya Surîyê ne jî, weke kurd nasnameya wan ya netewî bi fermî nayê qebûlkirin, weke ereb tênê qebûlkirin.

Partîya Komunîst a Surîyê û hemû partîyên şirîkên partîya Baasê rewşa kurdan neanîne zimên û li doza kurdan bi şêweyeke eşkera xwedî derneketine, heq û azadîya kurdan neparastine. Niha partîyeke reformê bi eşkere li doza kurdan xwedî derdikeve û piştgirîya têkoşîna kurdan dike. Divê partî û rêxistinên kurdan i vê partîya reformê re hevkarî bikin, ew piştgirîya hevûdu bikin.

Nêrînek li ser kesayetiya Haco Axa

Demhat Hezexî

Pêşgotin:

Ez di vê baweryê da me, kêm kes hene ku navê serokê êla Hevêrkan Haco Axa nebihîstîn, bi taybetî gelê meyê roĵava(Suriyê) wî baş nas dikin. Lê, dibe ku nêrînên der mafê Haco Axa de cuda cuda bin, ĵi ber ku Haco Axa kar û xebateka rêxistinî a siyasî di nav xelkên roĵava de kiriye û ev keda wî li ber çave, heta wî di nava rêxistina Xoyabûn de ĵî cî girtiye û bizaveka xwe ya xort û hêĵa di vî warî de heye. Lê, Haco Axa xwedî kesayetiyeka çawa bû û ramanên wî çibûn?.

1- Hatina Haco Axa li roĵavayê Kurdistanê û peywendiyên wî li gel firansiyan

Piştî şerê cîhanê yê yekem di sala 1926'an de Haco Axa tevlî hiĵmarek zêde (li dora çarsed malbatê) ĵi malabatên êla Hêvêrkan berê xwe da bin xetê .Ew bi xwe berî koçî bin xetê bibin, li herêma çiyayên di navbera Mêrdîn û Cizîrê de ĵiyan dikirin . Lê, dema Haco Axa tevlî êla xwe li hemberî dewleta Turk serî rakir û demekê şerkir, neçar Ma derbasî roĵavayê Kurdistanê bibe .

Li vê demê (sala 1926'an) hêzên Firansî ĵî giranî didan têkiliyên êlan û êl bo xwe pişt didîtin. Gava Haco Axa ĵî, hate roĵava û li wir nişţecih bû, hemû êlên xwe kire bin xizmeta Firansiyan û gelek êlên din li gorî armancên Firansiyan kirin yek. Heta demek şûnde mayîna Haco Axa li roĵavayê Kurdistanê

Firansiyan nasnameya welatiyên Suriyê da wî û li dora sala 1931ê li herêma Hisiça (Hesekê) Haco Axa bû xudanê çardeh (14) gundan û axeke zêde bû xwemaliya wî .

Êdî her diçû Haco Axa dibû dewlemend û xwedî komek çekdar .Ew bûbû serokek axa û bandora xwe berfireh dikir. Nimûne,li herêma Hisiça piraniya gundên xiristiyanan li ser navê xwe nivîsî û ji êla xwe gelek kes di ciyên fermî de cî kirin .

2.Belê hêza wî êlêtî bû, lê ew kesek netewperest bû.

Hêza Haco Axa ya siysî û aborî êlêtî bû . Lê, di warê netew perestiyê de gelek karê siyasî dikir û bi vî karê xwe li herêma Cizîrê navê wî belav bû û pir êlan xwe da dora wî. Heta tê gotin, wî gelek cihên kurdan vekirin û li ber derê mala xwe ala Kurdistanê bilind kir . Anku, ji aliyekî ve êlêtî û berjewendiyên kesokî û ji aliyekî din ve jî netewpenestî di kesayetiya Haco Axa de li pêş bû.

3. Sedemên bilindbûna Haco Axa li

roja vayê Kurdistanê

Berî her tiştî Haco Axa ne serokekî olê bû û civaka li roja va yekî wekî Haco Axa dixwest. Ji ber ku rewşa roja vayê kurdistanê di warê, siyasî, civakî û aborî de û kesayetiya Haco Axa yek bûn û her du aliyan bersiveke erênî didan hev. Firansî jî li herêma Cizîrê bi hêz bûn û pêdiviyên wan bi êlan hebû . Lê, Haco Axa tucarî girêdana bi axa welat ve ji bîr nedikir û tim dixwest ji bo gelê kurd pêngavnan pêk bîne û di vî warî de bandora wî li ser roja vayê kurdstanê gelekî çêbû.

ÇANDA TIRSÊ

Û

IMPERETORIYA XWÎNÊ

Pîr RUSTEM

Zanyarên Entirbiyologiya ji me re didin nasîn kuî mirov weke heyîn û aferîde vedigere ji berî nuha bi (100) sed hezar sal; ango em ji berî sed hezar salî ji kişwera sewalan qetiyane û me xwestiye kişwereke xwe ya cuda û taybet bidin damezrandin û helbet tu cudayiyên mezinî di wan deman deî di navbera mirov û sewalan de tinebûn û ne jî di navbera herdu kişweran deê Bi gotineke dinî em dikarin bibêjin kuî mirov jî di hovîtiya cinawiran de bûn û belkî hin caran hovîtiya wan dida ser a cinawiran jîî ji ber kuî cinawer dikuje tenê ji bo berdewamiya di jiyanê deê Lê evê din; mirov dixwest û hîne jî dixweze kuî xuristê bi hemû reng û warên wê têxe bin destlatiya xweê

Ev heyîna veqetiyayî nêzîkî (80) heyştê hezar sal dajo û têde hinek guhertinên mezin çêdibin; naskirina êgir şoreşekê di ewê civakê de çêdikeê Lê ev civakî di meseleyên ramyarî û hizrî deî ewan guhartinên mezinî li gor pîvanên îroî nasnakê da kuî bihêlin rûyê civak û heyînê û bi rengekî tûj bête guhertin û ev dîrokaî ku nerm dimeşeî dê bajo heya ji berî zayînê bi (10) deh hezar salî ji berî kuî mirov nivîsandinê nasbike bi (6) şeş hezar sal; dema ku dikare ayîn û baweriyên xwe û di riya afrandina pût û pêkeran reî derîne holê û ji bo nimêj û pûtperestina wan hin dîtin û baweriyên din derketin pêşiya civaka nuhî weke dayîna

qurbanan bo Xwedayanê

Û eger kuî em li evê pêgirta kevin; dayîna qurbanên mirovî bo Xwedayanî vegerin û li wê yekê ne tenê weke heyameke olî binirinî emê bibînin kuî ev gerdiş û bi tonrengên kuî ew qurban dihatin pêşkêşkirinî ji me re û bi rengekî tûj aşkere dike kuî ew rengê jiyan û çanda ji berî sed hezar salî ku mirov bi hovan re dijîî hîne ne miriye û careke din û di bin hin bawerî û navnîşanan de derdikeve çarçewêî lê evê carê ne ji bo kuî ew dixweze di jiyanê de bijî weke heyînekîî lê da ku ewê din têxe bin destlatiya xwe û ta kuî ewê armanca xwe bi cih bîneî divyabû bi darê zorê û riya êşkenciyê beê

Li gor xwendin û vekolînên kuî me di dayîkên pirtûkên dîrokî de kirine û weke kuî emê di evê lêkolînê de bibînin kuî kuştina ewê din; ewê ne li gor dîtin û baweriyên te û weke "gawir" li cem mislimanan tête bi navkirinî ne tenê tiştekî rojane û surîştî bûî lê ew ji bingehiya çanda wan e û ew li pêşiya nimêjkariyê bi xwe ye jî û eger kuî em li gotinên pêximberê mislimanan vegerinî emê evê yekê di gotinên wî de û bi rengekî aşkere bibînin; "... yek hate cem pêximber (Sê) û got: kîjan mirova çêtireÛ Got: bawermendek bi can û pereyên xwe ji bo XEWDÊ şer dikeî got: û di dû reÛ Got: bawermendek kuî di geliyekî de ji geliyanî nimêj dike û ..." ,1.ê

Û eger kuî em li dîrokê vegerin û nemaze ya mislimantiyêî emê bi sedanî eger kuî em nebêjin bi hezaranî li çêrokên ku evê gotina me bi cih dike rast werin û bi taybetî piştî kuî ew dibin xwedî hêzeke xurt û leşker û dikarin imperetoriyeke fireh bidin damezrandinê Lê ji berî kuî em ewê dîrokê didin vekolînî em dixwezin bibêjin kuî ev yeka ne bi mislimatiyê re hate holê; ango çanda kuştina "ewê din" ji Ola Îslamê kevintire û ew weke çanda hovîtiya mirovane kuî di qonaxên pêşî de ji jiyana wîî gerkiyeke heyîna wî bûî da kuî karîba di jiyana hovane de li

berxwe bide û bimîneê

Helbet ev jiyana hovane di hizir û ramyariya wan mirovan de cihekî berfireh girtiye û hêştiya bibe yek ji sitûnên hizrên wan ên olî jî; "gerdişa dayîna qurbanên mirovî di cîhana pûtperestiyê de tiştekî rojane û normal bû" ,2.ê Û evê yekê hêşt kuî IBRAHÎM jî kurê xwe ÎSHAQ weke qurban ji XWEDAyê xwe re pêşkêş bikeî ango ew çanda herêmêye; "di Quranê de û weke kuî di Tewrat û Telmod û Enacîlan deî pir navên Dojehê bi kar têtinê Û gotina Dojehê ewa kuî 77 caran di Quranê de tête vegerandinî ew bi xwe geliyê Bin Henome kuî pûtê Xweda MOLK li wire û dihêşt pûtperest qurbanên mirovî li ber bişewitînin û wilo geliyê Bin Henom bû geliyê kuştinê" ,3.ê

Lê hatina evan olên kuî bi nirîna tevayî têtin naskirinî ev çand kûrtir kirin; ji ber kuî ji nihadên evan olên tevayî ye kuî ew tenê li ser rastiyêne û dive ew ji bo gotina XWEDAyê xwe bê aramî kar bikin; çi bi gotinê an jî bi şûrî lew re me dît kuî ev olên tevayî hertim bi yên din re di şer û dogişan de bûnê Fîras SEWAH dibêje: "ew nimêjkariya kuî berve radeya ola tevayî diçeî bi evan nihadan tête naskirin:

1- Ew bizava kesekî bi xwe ye kuî dixweze şoreşekê li dar bixeê

2- Ew damezerê kuî dixweze oleke tevayî damezrîneî xwe tenê xwediyê rastiyê dibîneê

3- Ev nimêjkariya; ola tevayîî nikare bi xeynî xwe reî bi aştiyaneî bijî ... û ne dûreî ev nerazîbûnî rengê şer û cengan bistîneê

4- Hertim bang li mirûdan dike ..." ,4.ê

Tevî evê rastiyê jîî lê di nirîn û dîtinên me deî ev çanda kuştinê bi zarawaya sermiyandariya xasma re derket holê û em ewê yekê di çêroka kuştina Qayîn ji Habîl re dibîninî dema ku XWEDÊ dayîn û sermeyedariya yekî dipejirîne û ya ewê din jî vedigerîne; "Ji karên wan weke kuî XWEDÊ di pirtûka xwe ya zîz de gotî kuî QAYÎN HABÎL kuşt û dibêjin: ew

li beyara Qai kuşt... li xaka Şamê" ,5.ê Û ev kuştiyarîî dê bibe mercek ji mercên berxwedanê û zordariyê û nemaze ji xwediyên ramiyariyên tevayî; "... hema xwediyên xendekêî ewên kuî di wê demê de li bajarê Nicran li Yêmenê bûnî li ser dema mîr Zî NEWAS... ewê kuî li ser Ola Cihoyan bûî gihêşte wî kuî miletek li Nicrane û ew li ser Ola Xaçeperestiyêneî ewî bi ser wan de girt û ji wan re xendek kolan û tijî kuzotên êgir kir û Cihotî ji wan re pêşniyaz kirî ewê ku kete pey berda û yê kuî nepejirand ew avête nav êgir" ,6.ê

Ev ton çand dê derbasî Îslamê jî bibe û ji ber hinek taybetiyên Beyara Ereban û ziwabûna wê û digel merceke din kuî bi pisîkolojiya bindestiyê ve girêdayî yeî ewa ku êlên Ereban jê têşiyan û xwe weke dûvik ji herdu Imperetoriyên mezin; Pars û Roman re didîtinî hêşte kuî ew bi rengekî tûjtir û hovanetir evê çanda kuştinê bi rê ve bibin û weke kuî ew bixwezin tola xwe ji dîrokê vedin û helbetî pir caranî ewan bi hev jî kiriye û ne tenê bi "ewê din"ê

Di şerê Uhud de û piştî kuî misliman dişkên û pûtperes bi serdikevin û ji bo kuî ew kînên xwe li wan sax bikinî keç û jinên pûtperestan bi ser cendekên mislimanan ketin û bi wan lîstin; "jinên wan guh û bifn jêdikirin û ji xwe re dikirin gerdenî û HIND zikê HEMZE qelaşt û kezeba wî derxist û ew cûtî lê dema çêj jê nedît ew velûkir" ,7.ê

Û eger ku em li pirtûka Quranê vegerinî emê binirin kuî ewana ev çanda kuştinê xistiye pileya "pîroziyê" û "ewê din" hertim di bin zor û gefûguran de ye û êşkencî û kuştin ji wî re ye û dê ne tenê carekê yan jî demekê têde bimînin; "kî bi ya XWEDÊ û pêximber nekeî jê re agirê Dojehêyeî ewê heya bi heya têde bimînin" (72û23) ,8.ê "XXWEDA nifir li gawiran kiriye û ji wan re agirek peyda kiriyeî ewê hertim têde bimînin" (33û65) ,9.ê "xwediyên êgir ewê hertim têde bimînin" (2û39)

,10.ê Û emê evê dîtinê li ba xaçeperestan jî bibîninî tevî kuî YESOI bi diltenikî û dilovaniyê têtе nasînî lê dîsan jî ew nikare xwe ji evê çanda hovane rizgar bike; ji ber kuî ew jî law û berhema evê herêmêye û dê bihêle ew di Encîlê de bibêje kuî Dojeh "agirekî venamrêye" (Metî 18û8î 25û41) ,11. û "agirekî heya bi heya ye" (Metî 25û46) ,12.ê

Lê emê kuştiyariyên mezin kuî em îro dikarin wan di bin navê jînosaydê de bi nav bikinî di talan û girtinên wan ser milet û imperetoriyên din de bibînin kuî bi cendekên mirovan pire ava dikirinî weke şerê Tirk û Romanan ji bo Qistentînê; "ji Rom û Nesara dor şêst hezarî hate kuştinî gihêşt ku bi pêlêkirina cendekên wan yek bighe ser sûra bajêrê Bajar vekirin û şûr heya bi çend rojan hate bi kar anîn û xelkên wê kirin kole û Tirk piştî sê rojanî ku li Qistentîniyê digeriyanî bi derketin û ketin nav şar û merc û gundanî wan xelk digirtî dikuşt û weke koleyan dibirinî ta hatin û li ber sûra Qistentîniyê cih girtin û wekî çel rojî li wirî pîrek û zaroyanî bi paçekî û cilkeke ji dîbac û hevrîşim difrotin... û mêr tev kuştin û belkî jin û zaro jî ,13.ê

Lê emê evan komkujî û bêtarên han hîne di rojên pêşîn deî ji damezrandina dewleta îslamê û li ser destên pêximberê wan; Mihemed bi xwe jî bibînin û yek dikareî evan karên wan ên hovaneî di bin navê kuştin û jînosaydkirina "ewê din" de bide xwendinê

KUŞTINA EWÊ DIN:

Ne tenê ji bo hêsankirina xwendin û vekolînêî dê bihêle kuî em evê movikê bi xwe jî bi bêtirî navnîşanekê bidin naskirinî lê ji ber kuî "ewê din" bi bêtirî cureyekê hatiye naskirin û jînosaydkirina wî jî bi pir şêweyan hatiye meşandin; ango "ewê din" carina weke yekî "gawir" hatiye nasîn û pir carên din jî weke ewê ji ser riya ola xwe ya rasteqîn daketiyeî yan jî ew ne li gor pêşiyan eê Bi

gotineke dinî emê pir rengên kuştiyariyê bibînin; çi kuştina serokên êl û miletan û herifandina dewlet û serhildanên wan û çi jî kuştiyariyên wan ên li hember hev û ka kiyê destlatiyê bi dest xwe ve bîne û ev yeka hîne di roja pêşînî ji mirina "pêximber" derdikeve holê; dema ku ew dibin sê alîgir û ji bo cîgiriyê du rojan cendekê pêximberê xwe li erdê dihêlinê

1- PALÎNKIRINA SEROKATIYAN:

Emê Babik ELXUREMÎ weke nimûneyeke balkêşî li ser evî mejiyê mislimantiyê û nepejirandina dengekî nuh; dengê perîşanan kuî bang li guhertinan dikirî bînin ku çawa ew bi destê dezgeha îslamê têtе kuştin û bi çi şêweyê kuî qet yek nikare bawer bike; "Di hin çiyan de li aliyê Ezrebêcanêî di salên dused û yekan deî yek bi navê Babik ELXUREMÎ derket û pir xelk bi pey wî ket û... wî pir leşker şikandinî heya ku ELMUITESÊM di salên dused û pîst û sisiyan de leşkerên xwe bi ser wî de şandinî di bin serokatiya EFSÎN deê Wan şer kir û wî BABIK û birayê wî girtin û anîn û dema ku dikevin hundirî bira dibêjêyê: BABIKî tiştê ku te kir ti kesî nekirî û anuha aramiyekê bikêşe ku ti kesî nekêşayeî wî jê re got: tu yê anuha aramiya min bibînîê

Û ELMUITESÊM fermanê dide kuî herdu dest û lingên wî jê bikinî û dema wan dibirinî ew riwê xwe bi xwînê paş dike û dihêlê ELMUITESÊM jê re bibêje: tu di mêrxwaziyê de wilo û wiloyeî vêca çima te riwê xwe paşkirî gelo ew ji ber tirsa ji mirinê bûî wî got: naî lê dema pê û destên min hatin birîn û xwîn çûî ez tirsiyam ku bibêjin ew ji tirsa re zer bûye û wilo gûman bikinî lew re min riwê xwe bi xwînê veşartî da kuî ewê tiştî li ser nebînînê Û piştî wê yekê seriyê wî jêdikin û yê birayê wî jî û li ser laşê wan êgir dadidinî bêyî ku deng ji wan derkeve ,14.ê Lê dê pir neçe û di rex wî de textekî din dê bête

venandin û MAZYARî dê li ser bête xaçkirinî lê piştî kuî ew bi xêzeranan bête kuştinê (vegere Miroc Elzehebî Cê4î Rê61)ê Û wilo zincîra mirovên kuî li ser textan dihatin xaçkirinî dê her û her dirêj bibeê

2- QIRKIRINA HEVBENDIYAN:

Emê di evê movikê de jî bibînin kuî çawa piştî Dewleta Îslamê dibe xwedî hêz û dezgeh û leşkerî ew vedigerin hevbendiyên duh û wan didin ber kuştinê; piştî kuî leşkerên Qureyş ji dorpêçkirina bajarê Midînê vedigerin Mekê û benî Qureyza bi tena xwe di nav lepên MIHEMED û hevalên wî de dimîninî ew wana (25) pîst û pênc rojan di heşargehê de dihêlin û piştî kuî ew omîdiyên xwe dibirinî radibin şandeyekî xwe; Şas bin QEYS dişîni ba MIHEMED û obeya wîî da kuî ew rê bidin wanî weke ku çawa ji berî wê dabûn benî Nedîr û ew rahêjin mal-mewal û zariwên xwe û ji Midîne koç bibinê Lê piştî danûsitandinêî ŞAS têdighe kuî ewê nikaribin seriyên xwe ji ber lêdana şûr bi parêzinî nemaze gava ew dizane kuî MIHEMED biryar û fermana wan daye dest Seid bin MUAZ; serokê êla Ews ku kîneke wî ya kesîtî bi Cihoyan re hebû û wilo SEID fermana wan dide û dibêje: "dada min ji wan re kuî mêr bêtin kuştin û pere bêtin parvekirin û jin û zaro jî bibine koleê Pêximerê XWEDA (Sê) ji SEID re dibêje: dadkirina te ji wan re ji ya XWEDÊ yeî ewa ji jorî heft ezmanaê

Û ew zelîl bûn û pêximberê XWEDÊ (Sê) ew li Midînê di mala bint ELHARIS de girtin û di piştre pêximberê XWEDÊ (Sê) derket çarşiya Midînê –ewa ku îro çarşiya wê ye– û xendek tê de kolan û şandin pey wanî ew ref bi ref tanîn û li ustiyê wan didan û di nav wan de dijminê XWEDÊî Huyî bin EXTEB û Keib bin ESEDî serekên miletî û ew dora şesid-hefsidî bûn û ewên pirdikin jî dibêjin dora heysid-nehsidî bûn... pêximberê XWEDÊ (Sê) ferman dabû kuî

her ewê simbêlên wî derketibin gereke were kuştin ,15.ê

Û ewê bighên radeyekê kuî aşkere bang li kuştinê bikin û wê weke silogana germkirin û tûjkirina mirûdên xwe bi kar bînin û emê ewê yekê di pir şer û dogişên wî; MIHEMED de bibînin û nemaze di şerê li dijî Benî Mustelîq; Ibin Hîşam dibêje kuî "silogana Mislimanan di roja Benî Mustelîq de: Mensorî bimirî bimir bû" ,16.ê

3- HOVÎTIYA TALANAN (XEZEWATAN):

Lê hovîtiyên mislimanan ên aşkere û rasteqîn yek dikare di girtin û talanên wan deî ewên ku bi navê xezewatan têtin bi nav kirinî bibîne û nemaze yên li ser miletên din; "mewaliyan" û yek dikare wan bê dudilî bi jînosaydê bi nav bike; "ELBILAZIRÎ di Fituh Elbildan de dibêje: piştî ku Ebdelah bin AMÊR ji vekirina Cor vekişiyaî êrîş bir ser xelkên Istexir û ew bi zorê vekirî piştî şerekî dijwar kuî mencenîq bi kar anîn û têde 40 000 ji Eceman hatin kuştin" ,17.ê "êêê û –Elrebîi bin Ziyad ELHARISÎ– bajarê Zirbixî ji Sicistanê dorpêç kirî piştî ku bi xelkê wê re şer kirî vêca EPERWÎZ rabû Merzebanê xwe weke şandek bo wî bi rêkirî da kuî bi wî re peymanekê lidar bixeê Wî –ELREBÎI– candekek ji yên kuştiyan xwest û li ser rûnişt û bi ser yekî din de jî pal veda û hevalên xwe jîî her yekî li ser cendekekî bi rûniştin da... û peyman bi wan re îmze kir ,18.ê

Û li ser dema ELMUITESÊM jî pir talanên li ser miletên din çêdibin û bêtirê wan jî li ser Imperetoriya Roman û bi hezaran kes têne kuştin û di yek şerî de ji sedê şeran "sî hezar ji wan kuşt û MUITESÊM çar rojan têde rûdine; (di bajarê Zebitre de) û wê dişewitîne û huldişîne" ,19.ê Lê ewên pêşîn û komkujiyên wan ne kêmtirî evên paşin bûn û pirê caran evana ewî ji xwe reî weke simbol dîtine û li pey wan çûneê

4- OMER Û KOMKUJIYÊN WÎ:

Belêî eger ku em li kar û biryarên cîgirê duyemîn; Omer bin XETAB vegerin û wan hêdî hêdî bidin ber xwendin û vekolînanî emê bibînin kuî ew jî lipey hostekarê xwe; MIHEMED çû yeî lê wî bêtir û bi şêweyeke bernameyî ev çanda kuştin û jînosaydkirina "ewê din" bi rêve biriye; "Omer bin ElXETAB nameyek ji kargerê xwe yê li Besraî Ebo Mûse ELEŞEIRÎ re şand û têde got: xelkên Besra di ber çavên xwe re ke û te kî ji mewaliyan; (mislimanên ji xeynî Ereb an) û ewên kuî ji Eceman misliman bûne û gihîştî pênc bostan dîtî li kepira wî bide... hd" ,20.ê

Lê Ebo MÛSE bi Ziyad bin EBÎH şêwirî; ka ew çawa bikeê ZIYAD jê xwest kuî ew wilo neke û careke din li OMER vegereî Ebo MÛSE bi gotina wî dike û eynî ZIYAD digel nameyekê dişîne ba OMERê Ew dikevin danûsitandinê û li dawiyê dikare OMER bighîne ewê baweriyê kuî ev yeka dê bihêle rêza piştgirên wî ji ser hev hilweşe û ev karê ZIYAD dê bihêle kuî piştî demeke derngî MUAWIYA di nameyeke xwe de loman jê bike û bibêje: "Bira eger ku te OMER ji wê yekê venegeranda baî dê bibûya rêdanek û ewê bimeşiya û XWEDÊ yê ew pakbikirana û damar û rêşalên wan hilkirana û cîgir tev dê li ser ewê riyê biçûnaî ta kuî ne por û ne nênûkek û ne jî ewê pife êgir dike bimana..." ta dibêje: "Li mewaliya û Ecemên ku misliman bûne binir û wan bi sinet û rêdana Omer bin ELXETAB bibe û di wê de şikinandin û pûçkirina wane" ,21.ê

Û OMER bi rengekî fireh û sayî fermanên xwe ji Ebî Mûse re bi rêkiribûn kuî nahêlin ti gûman bighên baweriyên yekî kuî ewî ji bo qirkirin û jînosayd kirina "ewê din" kar dikir û ev yekaî di nirîna me deî rê ji evan miletên din re vedike kuî ew îro dadkirina dîroka mislimantiyê vekin û serdar û serokên wan weke gunehbarên şer bidin

dadkirin û ji bo çespandina eva dîtina xweî em dikarin biryar û fermanên kuî OMER ji kargêrê xwe Ebî MÛSE re bi rê kiribûnî bînin zimên; "De ka em binirin çiye sinet û rêdana OMER di evan Ecemên kuî welatên wan hatibû vekirin:

1- Ereb jinên wan bistîninî lê jinên xwe nedin wanê

2- Ereb bibin beşbirên wanî lê ew nikarin beşbiriya Ereban bikinê

3- Di riziq û dayînên bo wan de destê xwe bigirê

4- Di şer û cengan de wan têxe pêş û rêkan bi wan dûz bike û daran pê bibireê

5- Çênabe kes ji wanî di nimêjê deî pêşrewiya Ereban bike û ne jî têkeve rêza pêşînî ta kuî Ereb tev cihên xwe distînin û rêz temam dikinê

6- Ti derî ji deriyan û ne ti welat û dûgelan bide dest wan û ne jî kesî ji wan bike dadwer û xwedî fermananê

Û ewî got: Birayê minî eger ku OMER seraneya yên mewalî nekira nîviya yên Ereb –û ew ji bawermendiyê ve nêzîke– dê çawa Ereb di ser Eceman re bana" ,22.ê

ŞERÊN MISLIMANAN DIGEL HEV:

Em di movika çûyî de li ser hinek bûyer û çêrokên kuî mislimana bi seriyên "ewê din" kirine rawestiyan û me dît kuî wan çi bêtar tanîn seriyên wan û ew dighêşt pileya jînosaydkirina ewan miletanî lê emê di evê movikê de bibînin kuî qirkirina wan ji hev re; ya mislimana xwe bi xweî ne kêmtirî ewên ku tanîn seriyên "ewên din" e û belkî hin caran bi rengekî hovanetir hatine meşandinî nemaze û piştî aşkere dibe kuî çêroka mislimantiyê û sirûş û pêximberîtiya MIHEMEDî derew bi derewe û ew tenê ji bo sermiyan û destlatiyê bû û vaye cîgirekî mislimana; Elwelîd bin Yezîd bin EBDULMELÊK û piştî bi tîrkevanê pirtûka Quranê qul dikeî nirîna xwe di derbarê evê meseleyê de tîne zimên û bi rengekî ristî; "Haşimiyek bi

cîgiriyê lîst bêyî kuî sirûş jê re bê û ne jî pirtûk" ,23.ê

Helbet û li gor bawerî û xwendin û karên mislimanan bi xweî yek dighe ewê encamê kuî ev dîtina han ne tenê ya WELÎD bû û ewana ji pêşî de fêmkiribû kuî çêrok çêroka sermiyan û destlatiyê ye û ji ber ewê yekê ve xebatên xwe ajotine; ji ber kuî eger mirov wilo lê nenire dê çawa karibe têbigheî ji berî ku bi pejirîneî ku du mirovî kêşeyên digel hev şerdikin û hevdu dikujinî weke di şerê Elcemel deî ewa di navbera pêrewên ELÎ ji aliyekî ve û li aliyê din jî AÎŞE û ZUBÊR û TALHA û li dawiyê herdu jî dê buheştî bin; evan tevan soza buhiştê sitandiyeî belê dê çawa bawermendek karibe evê yekê bi pejirîne û bi destên evanaî bi hezaran hatine kuştin; "... û di dû re şerê Elcemel kuî xwestin tola cîgir (OSMAN) hildin û ji aliyê kêve; kuştarên wî bi xweê Û çi ferman ji şerê Elcemel gird û bêtartir bû; têde bi hezaran ji mislimanan hate kuştin û têde rih û simbêl û birh û bijang hatin hilkirin û peyayên Ebdil QÊS weke seyan dixuşandin û ew bê guneh dikuştin" ,24.ê "Û li ser rîşmê deve heftê destî ji yên benî Debiî hate jêkirin" ,25.ê Belêî her ku destek dihate birînî yekî din dibezî û rişmê deveyê kuî AÎŞE li ser piştê rûniştibûî digirt û pir nediçû û ew jî dihate birînê

Lê ev şer û kuştinên mislimanan digel hev jîî pir şêw û reng sitandine û emê ji bo firehkirin û hêsankirina mijar û têgihêştina wêî wan di bin hinek movikan deî bidin şirovekirinê

KUŞTINA MALBATA ELÎ:

Me di pêşî de ew anîn ne ji ber kuî ew ên pêşînin ku bi destên mislimanan hatine kuştinî dayîkên pirtûkan ji me re salix didin û weke me berê jî gotibû kuî ewana hîne di roja pêşîn de li hev nekir û du rojan cendekê pêximberê xwe li erdê hêştinî ta kuî Ebo BEKIR û bi piştgirî û zordariya OMER karîbû cîgiriyê bi dest xwe ve bîne û emê

bibînin ku karê wî; Ebo BEKIRî yê herî pêşîî wî leşkerên xwe bi ser hinek êlên Ereb ên mislimana de şandiye û ew dane ber kuştin û qirkirinêî tenê çima wan gotibû; nema ji îro û bi şûn ve em pereyên seraneyê "zikatê" didin mal-pereya mislimanan û emê wan li belengaz û perîşanên xwe belav bikinî heya gihêşt pileya kuî nivîskarên mislimanan bi xwe li ser ewê yekê rawestin; "ew sedsala ku di piş –di dû MIHEMED– reî bi pêncî salî hatiyeî sedsala herî kuştiyariyê ye; têde HUSÊN hate kuştin û Midînê hate dagirkirin û Mekê hate dorpêçkirin û Kevirê Reş jî hate herifandin û cîgiran mey vexwar û pûştî kirinî weke kuî bi Yezîd lawê MUAWIYA û Yezîd lawê ATIKÊ û... re bûye û têde xwînên gunehbar hate rijandin û misliman hatin kuştin û lawên piştgir û koçberan kirin kole û nîşan li ser destên wan hatin kişandin weke kuî çawa li ser destên ên Romanan ,26.ê

Belêî me malbeta ELÎ di pêşî de anî û ew jî ji ber sê sedemên girîng; ewa pêşîn kuî ELÎ û hîne di roja pêşîn de nerazîbûna xwe ji cîgiriya Ebo BEKIR re da xûyanî dema kuî ew naçe rûniştina Siqîfêî da kuî ew jî dengê xwe bide wî û ew yeka dê bihêle kuî OMER êrîşê bîne mala wî û ji ber kuî FATÎME; keça pêximber û jina ELÎ bi xwe jî ne bi ewê dengdanê re bû û nedixwest derî ji wî re vekeî OMER ew di piş derî de guvaşt "û şopên evê guvaştina sert û hişk dê di hundir cendekê FATÎME (Sê) de bikolin û ewê nesax û şînayî bikeveî ta kuî di dû bavê xwe reî bi çend rojanî koç bike" ,27.ê Sedema duyemîn jîî ku evê malbetê bi kerwanan "şehîd" dane û li ser destê herdu dewletên Umewî û Ebasî; "... û çiqwas dîwar li serElewiyan girtine û ew bi saxî xistine bin bingehên avahiyan û ew ... ta bi ta jî di zîndanan de hêştine û ew xistine hundirê qutîkan jî" (xwendevan dikare vegere pirtûka Elşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê393û394)ê

Sedema sêyemîn jî ji bo

girîngî û "pîroziya" evê malbetê û da kuî em ji xwendevanan re bibêjin kuî ewên karibin evan bêtaran bînin seriyê malbeta herî "pîroz" li cem xweî dê jê re tiştekî pir normal be kuî jînosaydê bînin seriyê "ewê din"; "Ji rasteqîna hezkirina vê netewê; (Imeta Mislimana) ji serekê mala Xwedê; Elî bin ebî TALIB reî wî zarên xwe agahdar kirin kuî wî bi dizî veşêrinî ji ber ku ew li ser xweî piştî mirinê û veşartinêî ditirsîê Û ji rasteqîna hezkirina... temiya ELZEHRA kuî wê bi şev û dizî veşêrin û ta nuha kes gora wê nizane û ji rasteqîna hezkirina vê netwêî ji xwediyên malbatê reî şerê wan bi HESEN; rihana pêximber reî ta hêştin ku... û bi vexwerdandina jehirê ew têtе kuştin... û ji rasteqîna hezkirina... kuştina wan ji HUSÊN; law û rihana pêximber bi ewê şêweya hovane û bêtarên dîtir ên di piş reî ku netew di nav dudiwan de par ve bû; yên kuştiyar û yên nexemxwar... û ji rasteqîna hezkirina... tiştên ku wan bi zarên HESEN kirine; Derxitina wan ji Midînê ta bi Îraqê û ew girêdayî û zîndankirina wan li Haşimiyê kuî şev û rojê ji hev dernedixistin û eger kuî yek bimira ew wilo bê şûştin û veşartin dihîştin... ta ku zindan bi ser wan de hilweşiya û ev netew di nav dudiwan de par ve bû; yên kuştiyar û yên nexemxwar ,28.ê

Lê rijandina xwîna evê malêî dê di ELÎ û zaroyên wî de raneweste; ELMESÛDÎ dibêje: "şer û dogişên di navbera xelkên ÎRAQ û ŞAMÊ de heftê bûyere"ê (Miroc Elzehebî Cê2î Rê360)ê Ewê di her demekê deî ku tenê hinek derfet ji wan re çêbdibûnî li hember rikbirên xwe derkevin û doza tolhildanê bikin û yek ji wanî "Zeyd bin Elî bin ELHUSÊN li hember Hîşam bin Ebid ELMELÊK derket û ew di şêr de hate kuştinî rabû hevalên wî ew di cokeke avê de veşartin û ax û şînkayî bi ser gora wî de kirinî da ku veşêrinî lê serkêşê leşkerê HÎŞAM cihê wî dinase û seriyê wî ji HÎŞAM re dişîne û HÎŞAM jî jê re dinivîse kuî wî tazî xaç

bike... û di dû re jî dişewitîne ,29.ê

Yolyos VELHOZIN jî di derheqa evê çêrokê dinivîse: "Û bi fermana cîgirî lawê Iraqê (Yhya bin Zeyd bin ELÎ) hate şewitandin û xaliya wî jî avêtin avê" ,30.ê Lê Zeyd bin ELÎ bi xwe jî li hember cîger şer kiribû û di şêr de "tîrek wî birîndar dike û dema derdixîninî ew li malekêî di cada Elberîd deî dimre û di cokeke avê deî piştî ku avê ji ser dibirinî vedişêrin û ji nuh ve avê berdidinê Lê di dû re ew cih tête naskirin û lêşe derdixinî di pişt re dibin Kofê û li wir xaç dikin û li wir xaçkirî dimîneî ta ku HÎŞAM dimreî hema serîî ji Şamê re dişînin û di dû re jî ji Midînê re ,31.ê

Û ELMESÛDÎ jî evê çêrokê tîne zimên kuî çawa li ser dema Hîşam bin Ebdulmelêk bin MERWAN û careke dinî şîa û di bin serokatiya Zeyd bin Elî bin ELHUSÊN de serî hildidin û weke hertimî ew jî dixweze ji bajarên Îraqêî ji Kofê de dest bi serhildana xwe bike; "êvar dahatêêê û ZEYD tev de bi birîneî û tîrek jî li eniya wî ketibû... tîr kişandin û ew di ewê katê de mir û ew di cokeke avê de veşartinî û li ser gora wî ax û çawîr dane hevî û av di ser re berdan..." ,32.ê Lê YOSÊF ew derxist û seriyê wî ji HÎŞAM re şand û di dû re jî û bi fermana HÎŞAM wî tazî bi darve dikin û ta pêncî mehî wilo dihêlin û di piş re jî dişewtînin û xaliya wî bi bê re berdidinê

Emê di dû re bibînin kuî seriyê kurê wî jî; Yehya bin Zeyd bin ELÎ di nav destên Elwelîd bin Yezîd bin Ebdulmelêk bin MERWAN de ye û ew jî dê bi darvekirî bimîneî ta ku Ebo Muslêm ELXERESANÎ cendekê wî dadixîneî dema kuî li ser destên wî dewleta Umewiyan dişke û ya Ebasiyan ava dibeê (ji bo lênirîneke bi firehî xwendevan dikare veger Miroc Elzehebî Cê3î Rê225)ê

Lê Ebî MISLIM bi xwe jî dê nikaribe seriyê xwe bi parêze û piştî kuî ew dihêle Ebasiyîn bi ser kevinî ewê li ser destê Ebî Ceifer ELMENSÛR were kuştin û ji berî wî bikuje û piştî kuî Ebî

MISLIM jê re dibêje: "mîrê bawermendan min ji dijminê xwe re bihêle"î dê lêvegerîne û bibêje wî: "XWEDÊ min nehêle eger kuî min tu hîşt! Ma dijmin ji te dijmintir ji min re hene" ,33.ê Lê bila Ebî MISLIM ewqasî li xwe negre û zor nebîneî vaye wî amê xwe jîî Ebdulah bin ELÎ; mirovê duyemînî piştî Ebî MISLIM ku hêştibûn dewleta Ebasiyan bi ser keveî da kuştinê Û ji bo kuştina Ebî MISLIM xelkê Xeresanê û yên Çiya û Teberistanêî di bin serokatiya kesekî bi navê BESINFAD de kom dibinî ta ku tola wî hildinî lê nêzîka şêst hezar kes ji wan tête kuştin û ew direvinê (vegere Miroc Elzehebî Cê3î Rê306)ê

Ne tenê wiloî lê dighe ewê pileya kuî ew zarziçên ELÎ bi tevayî didin ber kuştinê û ev yeka dê bihêle neviyekî ELÎ; Ebdulah bin ELHESEN ji Ebî Ceifer ELMENSÛR re bibêje: "Eba CEIFER me di Bedir de ne wilo li we kir" ,34.ê Û wilo em têdighên kuî çêrok çêroka tolvedan û destlatiyê ye û ne ya ayîn û baweriyê ye û eger kuî em li gotina ELMENSÛRî ewa ku ji kurê xwe re dibêje; "heya ew sax ba dêî destlatî ne ya te bûya"î piştî ku ew Ebî MISLIM dikuje û lawê wî bi bîra wî tîne kuî ew dostekî wan bû û çima ew kuştî vegerinî emê evê rastiyê bi rengekî beloq bibîninê

Ev kîn dihêle kuî ew dîwarên zindanan bi ser girtiyan de biherifînin û ji bihna laşeyên kuî di nik yên birîndar de maneî ew hinek pixûr kuî bi dizî derbasî cem wan kiribûnî pêdixîninî da kuî hinekî bihna ewan laşan kêm bibeî lê birînên wan yên kuî her diçû û ew diwerimînî dê bihêlin kezebên wan jî biwerime û pê bimrin û ewana bi evê yekê tenê nekirî lê wî; ELMENSÛR seriyê kur ji bav re weke xelat jî şandiyeê (Vegere Miroc Elzehebî Cê3î Rê310)ê

Ev tev li aliyekî û eger kuî em li çêroka ELHUSÊN û şêweya kuî ew û heval û malbeta wî pê hatiye kuştin vegerinî emê ne tenê kîna evan ji hev re nasbikinî lê yek dighe ewê baweriyê kuî piştî dewlet û dezgehên mislimantiye xurt

bûneî ewana karîbû çiqasî dîrokê sexte bikin û ewê hovîtiya xwe veşêrin; "di dehê Elmuheremî roja çarşemêî dehê Oktober sala 680 Zê û piştî nimêja sibê her komek ji bo şêr rêz girt... û ji berî şêr jî HUSÊN hin gotin û gotûbêj ji dijminên xwe re gotin... û piştî avêtina tîranî şerê bi şûran dest pê kir û hevalên HUSÊN xatir jê xwestin... ew tev hatin kuştinê Lê neviyê pêximber (ELHUSÊN)î kesî newîrî ew bikuştaî ta kuî ŞEMIR çû û karîbû ev dudiliya bişkanda... di pêşî de ELHUSÊN ji danişgeha zaro û pîrekan bi dûr xist û... li wir gelekan bi ser de girt û xistin bin derb û lêdananî ta kuî sî û sê kêr û sî û çar derbên şûr lê kirin û çi tiştên li HUSÊN bûn jê dizîn... û xelkê bi ser mal û mewal û deveyan de girt û ew dizîn... û xelkê bi ser jin û xawrin û pirtikên ELHUSÊN de girtî ta dest avêtin cilên li bejna pîrekan jîêê ê

Û şehîdên Kerbela li Xadiriyê veşartinî lê seriyên wan jêkirin û ew birinî heftê û du serî digel Şemir bin zî ELCEWŞEN û... birin ba Ebdulah bin ZIYAD û wî jî bo cîgir (YEZÎD)î li Şamêî bi rêkirinê Ew pir şabû û kêfkir û hêşt kuî çovekî têxe dest xwe û pê devê ELHUSÊN bikole ,35.ê Lê ewê bi evê yekê tenê nekin û dê bighe kuî ELMITEWEKÊL fermanekê derîne û ji berdestên xwe bixweze kuî gora ELHUSÊN vedinî da ku dûz bikin û ne dûre kuî hestî jî bişewtandanaî weke ku çawa bi yên cîgirên Imewiyan kiribûnê (li Miroc Elzeheb binireî Cê4î Rê135)ê

Ev kuştin û tolvedana ji hevduî dê tenê li cem malbeta ELÎ raneweste û ewê dirêjî pêrewên wî jî bibe û dê bihêle kuî cîhana mislimantiyê par ve bibe û du riyên sereke û ji hev cuda peyda bibin û pir caran yek gûman dike kuî qet ew ne yek ole û ewê li nivîsên herdu kêşeyan vegerê evê rasteqîna han û bi rengekî beloq têde dibîneî vêca û di movika bête deî emê li ber hinek şerên kuî di navbera van herdu kêşeyan; "sinê û şîa" de derketneî rawestinê

ŞERÊ KÊŞEYAN:

Piştî kuştina Osman bin EFAN rê kete Elî bin ebî TALIB kuî ew cîgiriya mislimanan bi dest xwe ve bîneî lê li hember wî du pêl konevanîî du kêşeyên cuda derketin kuî her yek ji wan li cihê pêlava xwe digeriya û da kuî deslatiyê ji xwe re sar bike û di serokatiya yekê ji wanî dayîka bawermendan; AÎŞE bû û digel wê TELHA û ELZUBÊR bûn û me dît kuî çiqas misliman di ewî şerêî ku tenê rojekê li ber xwe dabûî hatin kuştin; "ewên ku ji hevalên ELÎ di ewê rojê de hatin kuştin pênc hezar ,kes. bûn û ji hevalê deve ,û bilî wan. ji xelkên Besra û xeynî wan sêzde hezar bûn û xeynî wê jî hate gotin" ,36.ê

Lê ev komkujîî dê li hember tiştên kuî di dû re hatin li darxistinî çêrokeke pir sivik û hêsan beî nemaze piştî kuî ELÎ di şerê Sifîn de dişke û hinek ji hevalên wî; ji şîa wî li hemberê derdikevin û dihêlin hêza wî ya leşkerî li hember leşkerên Şamê kuî di bin serokatiya MUAWIYA de derketibûn û doza tolhidana cîgirê sêyemîn; Osman bin EFAN dikirinî lawez bibeê Û eger tenê em li jimara kuştiyan binirinî dê bihêle yek hezarê nifîran li oleke wilo bîne kuî hêştiye "di sed û deh rojan de sed û deh hezar kes were kuştin" ,37.ê ELÎ bi tena xwe û tenê di rojekê de komek mirov dikuje; "ewên ku ELÎ bi destê xwe û di rojekê de kuştineî pêncsid û bîst û sê mêr in"ê (Miroc Elzehebî Cê2î Rê399)ê

Ev cobar û çemên xwînê dê di evê yekê de ranewstin û her biçe gola xwînê dê firehtir bibe û ewên kuî seriyên xwe wenda bikin dê bi qasî evan kelayên tirsêî ku ji me re avakirineî bin; "... mirov û komeleyên kuî ji bo şîetiyê hatine kuştin an jî hatine êşkencekirinî di her çerxekê deî nayên jimartinê Bes bûî eger kuî te bixwesta mirovekî di dewleta Benî Umeye deî bête êşandin û koçkirin û bêparkirinî heya kuştin jî kuî tenê te bigota ewî "tirabiye"*... mirov di dewleta Benî Umeye de xwe ji jin û xizmekarê xwe xwe diparast...

çiqas pereyên xelkê jê sitandin û malên wan hilweşandin û dest û ling jêkirin û xirnikên gewriyan birîn û xelk li ser kokên darên xurmê xaçkirin... wan Hecer bin UDEY û çarde hevalên wî ji Kofa anîn Şamê... û nîvê wan li Merc Ezra hatin kuştin... ew ji ZIYAD re vegerand û jê xwest wî bi rengekî pir xerap bikujeî rabû wî ew bi saxî xiste gorê... piştî kuî dest û ling û zimanê wî jêkirinî ewêê ê Û HECACî karmendê Benî Umeye ji bo şîiyetêî seriyê Kemîl bin Ziyad ELNEXIÎ jêkir û QENBERî xizmekarê ELÎ... jî serjêkirê

Û serdema Ebasiyan jî ji ya wan ne kêmtir bûî wan çiqwas helbestvan ji bo pesindana wan ji malbeta ELÎ re kuştine û zimanê hinekan jêkirine û pirtûkên hinekan şewitandine û gorên hinekan ji nuh ve vekirine û ew şewitandine... Elî bin Mihemed bin Emar ELBERQÎ pirtûka wî şewitandin û zimanê wî jêkirin û Ebo Elhesen Elî bin WESÎF... şewitandin... û ji komelên ji bo şîiyetê ku bi hezaran kuştineî şîiyên Efrîqa... û şîiyên Heleb jî kuî bi komîneî di sedsalên şesidî de hatin kuştin û... ê Û di serdema me de jî rêzdarekî Îranî û li ser dema Wehabiyanî di navbera Sefa û Merwe de weke berxekî tête serjêkirin piştî ku dadwer rê dide û bi boneya kuî wî bi lêvên xwe yên ku Ezra li ser danîbûnî Kevirê Reş "Keibê" qirêj kiribû" ,38.ê

Ango dewleta Ebasiyan û tevî kuî pismamên Elewiyanin eî ji evana reî ji dewleta Umewiyan ne çêtire û weke yek ji rûpelên dîrokê dinase kuî carina şerê wan dijwartir bû; "Û dewleta Ebasiya di karên xwe yên pîs de kuî bi Elewiyan û bilî wan re kirineî ji dewleta Umewiyan ne çêtireî ta gihîşt ku bi jîndarî dîwaran li ser wan bigrin û banên girtîgehan bi ser wan de hilweşînin û bilî wan pir tiştên din... ê Û SEFAH birayê xwe YIHYA weke şûngirekî xwe şande Mûsilêî wî yazde hezar ji Ereban kuşt û ji xeynî wan jî xelkekî pir di hundir mizgeftan deî piştî ku eman dabû wanê Û dema bi şev dengê giriyê pîrek û zariwan

dikeî fermanê dide ku wan bikujin tevî zariwa û bi wî re çar hezar reşikên Efrîka hebûnî wan bi zorê jin dibirinî weke kuî dîroka Ibin ELESÎR dibêje û... sixêf ji mîrê mislimanan; Elî bin ebî TALIB re digotin û gora HUSÊN ajotin û nedihêştin ti kes biçe serdana wî" ,39.ê

ŞERÊN ŞÎA HUSÊN:

Zarên ELÎî dê ji ser evê riya bav venegerin û ew jî yê bizav û çalakiyên xwe bikin kuî tola bav û hevalan vedin û vaye ELHUSÊN pêrewekî xwe; Muslêm bin EQÎL dişîne Îraqêî da kuî binire ka derfetên serhildan û tolvedanê hene yan naî lê ew tête girtin û derbasî cem Ubeydelah bin ZIYAD; kargêrê Yezîd bin MUAWIYE dikin û piştî kuî ew gotinên pir xerap ji hev re dibêjinî Ibin ZIYAD dêng li leşkerên xwe dike kuî wî derxin jorî koşka mîrîtiyê û... "bang li ELEHMERÎ dike... da kuî tola xwe jê vedeî ew derxistin jorî koşkê û Bukîr ELEHMERÎ li ustiyê wî dixeî seriyê wî di jêr wer dibe û laşê wî jî dikin dû seriyê wî û Hanêi bin UIRWE jî derxistin çarşiyê û seriyê wî jêkirinî tevî banga wî û ew kalekî ketî bû..." ,40.ê "Û ji 16000 peyayên ku soz dabûn dê biçin tenê 4000 kombûn... û roja çarşemê bîst û duduwê cemadiya pêşîn sala 65 a Kê (roja çarşemê 4 Yinayêr sal 685) an şer dest pê kir û ta roja înê dirêj kirê Û şîa weke şêran şer kirî lê barandina tîran ew kuştin û ji bilî hinekan kes ji wan nema" ,41.ê

"Û dema leşker li seriyê ELHUSÊN pir dibin û têgihişt kuî rê li ber nemanî got: XWEDA dadvaniyê di navbera me û miletê bang li me kirî da ku piştgiriya me bikin û nuha me dikujinî bikeê Wî şer kir ta ku hate kuştin û ewê kuî ew kuşt mêrekî ji Mizhec bû û seriyê wî jêkir û pê bezî cem Ibin ZIYAD... -da kuî zêr û zîvan bistîne-î cendekê wî jî bi derb û lêdanên şûr û xenceran ji hev êxistibûn û digel wî ev jî hatin kuştinî ji lawên birayê wîî Elhesen bin ELÎ: Ebdulah bin ELHESENî û

Elqasim bin ELHESENî û Ebo Bekir bin ELHESENî û ji birayên wî: Eleibas bin ELÎî û Ebdulah bin ELÎî û Ceifer bin ELÎî û Osman bin ELÎî û Muhemed bin ELÎ; û ji lawên Ceifer bin ebî TALIB: Muhemed bin Ebdulah bin CEIFERî û Iewin bin Ebdulah bin CEIFER û ji zarên Eiqîl bin ebî TALIB: Ebdulah bin EIQÎLî û Ebdulah bin Muslêm bin EIQÎL" ,42.ê Eger kuî ev tev ji malbata herî "pîroz" bin; ji malbeta ELÎî dê ji xelkên din çiqwas bin û evên ku dikarin tenê di cendekê HUSÊN deî roja ew têtе kuştinî şopên (33) sî û sê lêdanên xenceran û (34) sî û çar derbên şûran bihêlinî dê çi û cî bînin seriyê "ewê din"ê

Û em dikarin hîne bi sedan bûyer û serpêhatiyên weke evên me anîne zimênî di dîroka Islametiyê deî bibînin mîna Bûyera Eyn Elwerde û Benî Elnedîr û bilî wan pirên dîtirê Piştî şerê Elsifîn û derketina hinekan ji nav rêza leşkerên ELÎî ewê çend carên dî li hember wî derkevin û ji ewên kuî li hember ELÎ derketibûnî Ebdulah bin Weheb ELRASIBÎ û "di 9 sefer sal 37 kê (17 yolyo sal 658 zayînî) herdu leşker li hev rast tênê Û digel ELRASBÎ ji bilî 2800 peya ji koka 4000 an nemabû û yên pir hatin kuştinî weke ku cîgirê wan -Ebdulah ibin Weheb ELRASIBÎ- hate kuştin û..." ,43.ê

Û "Ibin ELESÎR hinek bûyerên dîtir kuî piştî şerê Sifîn li darketibûn... bi bîr tîneî ew dibêje kuî Eşres bin Uif ELŞÊBANÎî ewê tevî dused leşker li Deskera daketibûî di bihara duyemîn sal 38 Kê deî hate kuştin û Hîlal bin UILFE û birayê wî MICALÊD... kuî wan serokatiya bêtirî dused peya dikirî di sala 38 an de hatin kuştin û Eleşheb bin Bişir ELBICLÎ kuî 180 peyayên wî hebû li Circirayaî nêzîkî Diclaî hate kuştin û Ebo MERYEM... hd" ,44.ê "... û Xewarêcên Kofa aramî girtinî ta ku cîgirek ji xwe re bijartin... û ew derketinî bi ser wan de obeyek leşkeran şandin û ew tev hatin kuştin ,45.ê

ŞERÊN XWE BI XWE:

Weke me dît kuî piştî mirina "pêximber"î misliman bûne çend alîgir û her yekî ji wan dixwest cîgiriyê bi dest xwe ve bîne û evê yekê hêşt kuî pir şer û dogiş di navbera wan de derkevinî lê hinek misliman jî derketin û gotin: nema ji vir û şûnda em pereyan didin gencîneya mislimanan û emê wan li belengaz û perîşanên xwe belav bikin û yek ji evên kuî wilo dixwestinî Malik bin NUWEYRA bû; hevalê MIHEMED û ewê kuî jê re hatibû gotibin: "tu yeke ji ewan diheyên Bihuştî"ê

Evê xwestek û baweriya wan hêşt kuî destlatên mislimanan û nemaze OMER û Ebo BEKIRî ewê yekê weke jêvegerîna ji ser riya misilmantiyê bijmêrin û leşkerên xwe di bin serkêşiya Xalid bin ELWELÎD de bi ser wan de bişîninî da kuî wan vegerîne yan jî MALIK û miletê wî bikujin û dema wan dît kuî "XALID digel obeyeke leşkeran bi ser wan de têî MALIK ji miletê xwe xwest kuî rahêjin şûrên xweî lê dema ku XALID dighe ba wanî ew bi XWEDÊ sûnd duxe kuî ti ne rindiyê ji wan re naxweze û got: em nehatine da ku şerê we bikinî lê em mêvanên we ne û hêşt dilê MALIK rûne... û dema çaxa nimêjê bûî MALIK û miletê xwe rabûn ser nimêjê û XALID û obeya xwe jî êrîşî wan kirin û MALIK û miletê wî girêdan û di dû re jî kuştin... û gava çavên wî; XALID bi pîreka MALIK û bedewbûna wê dikevin dilê wî diponijêyê û ew gandariyê digel wê dikeî di ewê şeva kuî mêrê wê kuştiye de û seriyê MALIK û miletê wî jîî weke kuçikî xistibûn bin beroşên xwarinê û xwarina ganeyê li ser çêkirin û wî û obeya xwe xwarin" ,46.ê

BÛYERA ELHERA Û ZORDARIYA DEWLETA UMEWÎ:

Ji ewan şerên kuî ji bo cîgiriyê li darketineî em dikarin Bûyera Elheraî weke nimûneyeke balkêş bidin

xwendevanê Helbet ewên din jî; weke Şerê Sifîn û Elcemel û yên di navbera şîa HUSÊN û MUAWIYA deî ne kêmtirî evê bûyerê neî lê yek dikare ji ewana re hinek rêdan bibîne û bibêje kuî "kurtikê OSMÊN" di wê ortê de hebûê Hema Bûyera Elhera tenê ji bo cîgiriyê hate li darxistin û da kuî destlatî ji Yezîd lawê MUAWIYA re bimîne û bi çi şêwe û zordariyê; "Leşkerên YEZÎD êrîş birin ser Midînêî gava wan got em wî naxwezinî wan hinekî şer kir û ew revîn di bûyera kuî jê re dibêjin Elheraî rabû serleşker fermana bajêr kuî ew sê rojan seybeî derxistê Dibêjin ku di encamê de çar hezar û pênsid kes hate kuştin û hezar keçik ji keçkaniyê kirin û ev hemû tişt jî bi fermana kuî YEZÎD ji serleşkerê xwe Mislim bin EQBE re şandibû bû" ,47.ê ELMESÛDÎ jî evê yekê dibêje û ji bo firehtirîna lênirînêî yek dikareî vegere pirtûka wî; Miroc Elzehebî cildê sêyemînî rûpelên 78î 79î 80 êê

Helbet ev yeka ne tenê li bajarê Midînê pêkhatiyeî yek dikare bibêje kuî ti bajar ji "bajarên mislimanan" nemane kuî bi dehan bûyerên weke ya Elhera kuî pê nehatine û di encamê de bi hezaran xelkê can û şeref û malên xwe wenda nekirine; "... û xwediyê Şamêî Bisir bin ERTAT bi ser welatên mislimanan; Mekê û Midînêî cihwarên XWEDÊ û Pêximber de şandî mêran dikujin û zariwan serjêdikin û peran didizin û jinan direvînin û di dû re bûyera Kerbela bû û di dû re ya Elhera bû kuî têde koçber û piştgir û lawên wan hatin kuştin û bjarê pêximber (Sê) sê rojan hate seybkirin û gihêşt kuî bi sedan zaro bibinî bêyî bavê wan bête naskirin û eger kuî yekî bixwesta keça xwe bideî wî li xwe ne digirt ku keçaniya wê li cih be û digot: ne dûre kuî di roja Elhere de tiştek gihêştibe wêê Û koçber û piştgir û lawên wan weke koleyanî ji Yezîd bin MUAWIYA reî hatin pêşkêşkirinî eger xwest dê wan bike kole yan berde yan jî seriyê wan jêke" ,48.ê

Nivîskarên şîa bi rengekî firehtir li ser evê bûyerê radiwestin û ew hejmara kuştiyan û bêtarên dîtir pirtir û firehtir dikin; "... di bûyera Elhera sala 63 Kê deî Yezîd bin MUAWIYE ferman da Musrêf bin EIQEBE kuî têkeve Midînê... û sê rojan bi şevên wê ve ew seyb kirî piştî yê kuşt kuşt û yê dizî dizî û li seran serî wê demê jî agir pêketiye û yên mane jî ew bernedanî ta kuî wan xwe weke kole ji YEZÎD re xelat kirinê Û di encama dawî de hefsid kuştî ji rûçikên koçber û piştgiran û deh hezar jî ji ewên din" ,49.ê

Û bi evê sebaretêî cîgirê mislimanan; Yezîd bin MUAWIYE helbestekê dirêsê û ji dîroka mislimantiyê re dihêleî weke belgenameyeke dîrokî kuî ji me re sayî dikeî ka evên pêşîn heya kîjan radeyê baweriya xwe bi çêrokên sirûş û daketina Quranê û pêximberîtiya MIHEMED tanînî û vaye em hinek beytanî ji helbesta YEZÎDî pêşkêşî xwendevanan dikinê

"Xweska bapîrên min ên di Bedir de bidîtana tirsa Xezrec ji lêdana şûran

Ewana yê bi şahî bi hêl-hêla û bi lîlanda û bigotina: Yezîd destên te pûçnebin

Me kokên kevnar ji serekên wan kuştin û me dagerandina Bedir vegerand

Bila ez ne ji Xendef bimî eger ku tola xwe ji benî Ehmed û kiryarên wan venedim

Haşim bi sermiyaniyê lîstî ne salixek hat û ne jî sirûş daket" ,50.ê

Eger kuî helbesteke weke eva YEZÎD di roja îro de û piştî (1423) ê salanî ji aliyê "gawirekî" de û ne mislimanekî û hîne cîgirê mislimanan bi xweî bête nivîsandinî dê helwesta evan hêz û "zanyarên" mislimanan jê çibe û ewê çi fetwe û fermanan di dermafê wî de derînin; zincîra ewên kuî jiyana xwe ji bo evê yekê winda kirineî dirêjeê Lê ev bûyer û komkujiyên kuî di destpêka demezrandina Dewleta Umewî de pêkhatineî dê li ber kar û bêtarên ELHECAC dilopek ji dengizê be; ewê kuî di roja pêşîn de ji destlatiya xwe ya li bajarê

Kofa kuî derketibû ser diyarokêî gote cemawerê nimêjyaran: "bi XWEDÊ ez nirînin dilxwez dibînimî û ustûyin dirêj û seriyin ku gihêştine û dema jêkirina wan hatiye û ,ez. xwediyê wê meî weke ku ez li xwînê dinirim û ewê di navbera fûtê û rihan de diherike" ,51.ê

Em ewqasî nakevin dû çêrokên HECACî ji ber kuî dê bihêlin bi sedan rûpel bêtin dagirtin û dawî li wan nayêî lê emê tenê hin karên wî weke nimûne bînin zimên û ewê bihêlin em têbighên kuî ev dewlet tenê li ser xwînê ava bûye û eger kuî hinek aliyên wê yên ronahî û zanyariyê hene jîî ew bi xêra "ewên din" hatine holê û rola Ereban di ewê yekê de pir hindike; ew bi xwe û şer û cengan û destlatyê de ketibûn û ji zanyariyê re ne valabûn: "... û di piş re dewleta Benî Merwan hat... Merwan Ebid ELMELÊKî HECAC kir waliyê Hîcazê û di dû re yê Îraqêî wî Kevirê Reş (Keibê) hilweşand û dest û ustiyên koçeber û pişgiran bi nîşanan muhir kirî weke yên Romanan û jin û mêr bi hev re dixistin yek zindanên bê banî û di zindana wî deî pişgî mirina wîî bi hezaran xelk hate dîtin bêyî ti kes zanibe gunehê wan çiye",52.ê

ELHECAC bi xwe li ser xwe salix dida kuî tiştê herî kêfxweşiyê li ba wî peyda dike; "rijandina xwînê ye" ,53.ê Û li ser destên wî ne tenê bi hezarên hezaran hatine girtinî kuştin û şewitandin û ta jin û zarok jî ji bêtarên wî xelas nebûneî lê weke me dît ewî bi kuştinê re kêfxweşî didît; dema Şebîb ELXARICÎ dişke û pişgî kuî dê û jina wî dikujinî ew jî di avê wer dibe û dimreî lê cendekê wî ji HECAC re tîninî ew zikê ŞEBÎB diqelêşe û dilê wî derdixe û hîne dil jî daditerişîneê (vegere Miroc Elzehebî Cê3î Rê147)ê

ELMESÛDÎ jî pir rûpelan ji komkujiyên HECAC re vedike û dihêle tu bê dudilî bighî ewê baweriya ku dibêje: ew mirovekî sadî bû û tenê bi êşkencekirina "ewê din" re kêfxweş dibû; "HECAC di sala pêncî û nehan de mir û ew lawê pêncî û çar

salayeî di nîvê Îraqê deê Destlatiya wî li ser xelkê bîst salan ajotî û tête jimartin kuî tenê ewên seriyên wan jêkirine sed û bîst hezarinî ji bilî yên ku di şer û leşkergehên wî de hatine kuştinî û di zindana wî de pêncî hezar mêr mirî û sî hezar jin...” ,54.ê

DEWLETA EBASÎ Û TOLHILDAN:

Dewleta Ebasî jî ne bi hewceyî kuî em wê pêşkêş bikinî ewê xwe bi xwe li ser destê damezerê wêî ELSEFAH; cîgirê pêşîn ji benî Ebas reî pêşkêş kirî gava ku li ser diyarokê û di roja bijartina wî deî xelkê agahdar dike û dibêje: “ezim ewê xwînê dirjîne û seriyan jî difrîne”ê Û tenê eger kuî em li herdu fermanên wî yên herî pêşîn vegerinî emê bibînin kuî ew ol û dewlet li ser çi bingehê avabûye û çiqwas ji me re dive ta kuî em karibin ji evê pisîkolociya kuştinî serjêkirin û herikandina xwînê rizgar bibin; “biryara wî; (ELSEFAH) ya pêşîn... kuî cendekên cîgirên Benî Umeye ji gorên wan derînin û wan xizêrankin (celdkin) û bi daran ve xaç bikin û di dû re bişewitînin û ariya wan jî li ba kin... û ket pey Benî Umeyeî ji zariwên cîgiraî ew kuştin û ji bilî mendal û ewên kuî revîn Endelusê kes nefilitî” ,55.ê

Eger ku fermana pêşîn a dewleta Ebasî di dermafê miriyan de bûî weke me dît û ew ji gorên wan derxistin û careke din ew kuştinî weke ku çawa XWEDÊî “ewê din” hertim vedijîneî da kuî careke dinî wî di dojehê de bişewtîne û wilo em dikarin bibêjin kuî SEFAH karê XWEDÊ meşandiye û gereke ew ji aliyê mislimanan ve qet neyê pirotestokirinê Belêî eger ku biryara wan a pêşîn ew bûî lê ya duyemîn di dermafê jîndaran de bû; “û nuha biryar an bûyer an jî filîmê kuî ELSEFAH pê rabûye... Şibil bin EBDULAHî koleyê benî HAŞIM û di çêrokeke din de SEDÎFî derbasî cem Elî Ebdulah bin ELÎ û di çêrokeke din de ELSEFAHî dibeî ku nêzîkî nod kesî ji benî

Umeye li ba wî nên dixun û ta kuî ew bihêle sinaryoya filîmê bi meraqtir bibeî ew helbestekê bo ewê sibaretê dibêje û tîne bîra cîgirî ku bav-kalên evên nanê wî dixun çi û çi anîn seriyên bapîrên wî û wilo jê dixweze û weke kuî XWEDÊ ew şikinandineî dive ew jî wan daxîne pileya herî nizim û ne wan teklif bike û rûpelekî nuh bi wan re veke... û EBDULAH (û gotin ELSEFAH)î fermanê dide kuî bi daran li wan bidin ta kuî wan dikujin û sifre jî di ser cendekê wan re rêxistin û li ser nalînên wan nanê xwe xwarî ta kuî tev mirin" ,56.ê

Lê ewê ne tenê dijminên xwe bidin ber şûr û kuştinê û ew yeka bi xwe ji sinc û gerdişên ewan qonaxan bû û belkî li cem mislimanan hinekî bi rengekî hovanetir hatibe meşandinî lê hema tu rabî û hevalên xwe jî bide ber kuştinêî da kuî destlatî bi te tenê bimînîî dê ev yeka dûrî sinc û nihadên siwartî û mirovantiyê binî heya bi pîvan û sincên ewê demê jî; "dîroka dewleta Ebasiyaî li ser dema ELSEFAHî ji bilî rindiya dudiwan nizaneî yê pêşî Ebo MISLIM eî ewê ku dewlet li Xeresan da damezrandin û şûngirî da dest ELSEFAH û yê dudiwan jî Ebdulah bin ELÎ ye; amê ELSEFAH û serokê leşkerên Ebasiyanî diêêê û dibêjinî ku ELSEFAH dixwest herdiwan bikuje... ê Lê Eba Ceifer ELMENSÛRî cîgirê Ebasiyan ê duyemîn û damezerê rasteqîn ji dewleta Ebasiyan re... bi wî karî rabûî di pêşî de hêşt kuî Ebo Mislim ELXERESANÎî Ebdulah bin ELÎ bikuje û di dû re jî ew bi xwe Ebî MISLIM dikuje" ,57.ê

Helbet kuştina Ebî MISLIM dê dawiyê li kuştyariyên ELMENSÛR neyne û her û her ev gola xwînê dê firehtir bibe û pir mirovên din daqurtîne û bihêle çandeka li ser tinekirina "ewê din" ava bibe; "Elqadî bin ebî CERADÊ... dibêje: gava ELMENSÛR xwest biçe Hecêî di sala ku têde mirî; sala 158 anî wî deng li RÎTA kir; keça birayê xwe û jina lawê wî MIHEMED û hinek kilît dane wê û ew bi sûndên giran sûndkirin daî ku

ew deriyê hin zerzemînên wî ji ti kesî re veneke ta ji lawê wî re jîî ta kuî biçespînin ew mirî wê hîngê ew herdu tenê (û) bêyî yekî sêyemîn bi wan re beî (ew dikarin vekin)ê Û dema lawê wî bihîst bavê wî mirî ew digel RÎTA çû û ew derî vekirinî dîtina ewan komên kuştiyan kuî nav û nîşanên wan bi guhên wan ve daleqandî û jê dixûyan kuî tev ji benî Talibinî tirsek mezin xist dilê ELMIHDÎ û di cih de ferman da kuî kortekê ji wan re bikolin û wan têde veşêrin" ,58.ê

Bi mirin û veşartina komkujiyên wî di ewê kortê deî dê dawî li çêrokên kuştin û talanakirina "ewê din" neyê û vaye Haron ELREŞÎD jî dide ser riya bapîrê xwe; di serdema wî de û weke di her destlatiyeke zorker deî hinek li hember wîî di bin serokatiya Rafêi bin ELLEYS deî derketibûn û piştî ku wan dişkîneî ew bi wê yekê tenê nake û wan tîne û dike perçe perçe; "... û birayê RAFÊI xwest û (haron ELREŞÎD) got: we ez bihin teng kirim heya hêştin kuî ez êşa evê riyê hilgirimî tevî ku nesaxim jî... ezê kuştinekê te bikujim kuî cara ji berî te kes wilo nehatiye kuştin û wî ferman da kuî regez bi regez wî ji hev parvekin"ê (Miroc Elzehebî Cê3î Rê375)ê Û dighe kuî ew ên herî nêzîkî ji wî reî weke Ceifer ELBERMEKÎ jî bide ser riya dijminên xwe û seriyê wan jêbikeî nemaze dema kuî bidîta navûdengê yekî belav bûye û ewê karibe seriyê wî bi êşîne û bi kuştina wî tenê nakinî lê ew li êl û civaka Bermekiya vedigerin û wan didin ber talan û komkujiyên tevayî û heya gorandina mirovan jîê (vegere Miroc Elzehebî Cê3î Rê384 û şûnde)ê

Lê emê evan komkujiyan tiştekî normal bibînin gava kuî em bibînin bira seriyê birayê xwe jê dikeî ji bo destlatî û cîgiriya mislimanan; seriyê EMÎN ji MEIMON re diçeê (vegere Miroc Elzeheb Cê3î Rê422 û şûnde)ê Û ev çêrok dê ne cara paşin be û "... seriyê ELMUSTEÎN dê ji birayê wî ELMUITEZ re here"ê (vegere Miroc Elzeheb Cê4î Rê164)ê Û

ELMUITEZ bi xwe jî dê were kuştin û bi çiî "... hinek dibêjin kuî ew bi ava gerim hate derzîkirin"ê (Miroc Elzehebî Cê4î Rê 184)

Angoî evana qet rûmeta mirovan negirtî; ne gotine ev pîrejine yan jî zaroye û ji bo bi destxistina destlatiyêî wan her tişt bi kar aniye û bi sedê hezaran jî xelk dane ber kuştinê; "û rojên wî; (yên ELMUITEMED kuî têde destlatî kiriye) çarde sal û çar meh bûnî wî yên bi çûk û mezin dikuştinî û mêr û jinî û dişewitand û hildiweşandî û ew hate Besrayê û di yek şerî de wî sêsed hezar kes kuşt" ,59.ê Lê piştî bi destxistina destlatiyê jîî careke dinî destên xwe ji rijandina xwînê ne şûştine û li ewên kuî ji cîgiriya ji berî wan maneî vegerîne û ew dane ber kuştin û qirkirinê û wan qet rûmeta ti tiştî negirtî; "êê û ewê kuî jê re digotin ELQAHÊRî diya cîgirê ji berî xwe bi lingekî bi darvekirî tevî nesaxiya wê jî û..." ,60.ê Ev hinek tiştên ku di dîroka Îslamê de pêkhatine û pir tiştên din heneî bi sedan û hezaran kuî yek nikare wan bijmêrê

KUŞTINA HEVAL Û ZANYARAN:

Di evê movikê de jîî emê nêzîkî mijareke taybet bibin; kuştina xwediyên yek ayînet û baweriyêê Li gor dîtin û têgihêştinên meî bûyerên di evê movikê de û tevî kuî ji yên çûne ne hovantirin jîî lê ew bi şêweyeke tûjtir hizir û mejiyê kesê misliman ji me re xûya dikin; ji ber kuî kuştina "ewê din"î ewê ne li gor dîtin û bawerî û kartêkirinên teî çanda herêm û wan qonaxan bûî lê hema ew bighe pileya kuî tu heval û xwedî yek dîtinê jî bikujeî dê ev hinek pirs li cem mirov peyda bike û bihêle em gûman bikin kuî ew bi derûn û pisîkolojiyeke ne sax ve girêdayiye û ta kuî em mijarê ronî bikinî emê hinek nimûneyên balkêş bînin zimênê

1- KUŞTINA EBDURIHMAN BIN

MILCÊM:

Weke me dît kuî hîne di rojên pêşî de ewana li hev nekir û nakokî kete navbera wanî lê dijberî û şerên giran dê di navbera şîa ELÎ û dewleta Umewî de derkevin holê û ji wan şeranî şerê Sifîn bû û belkî ew ê herî giran bû kuî di encamê deî sed û deh hezarî jiyana xwe wenda kir û evê bêtar û koma hestiyan hêşt kuî hinek ji mislimanan li hember evan kêşeyan derkevin û wan tev wek gunehkar bibînin û ew biryarekê bistîninî ku ev hersê kes; Elî bin ebî TALIB û Muawiye bin ebî SIFYAN û Emro bin ELAASî gereke werin kuştinî da kuî misliman ji ewê (fitnê) derkevinê

Û wilo sê kes ji evê yekê re têtin amedekirin û her yek ji wan berê xwe dide welatê kuî ev hersiyên me bi nav kirineî lê destlatiyê dikinî da kuî her yek ji wan ewî bi destê xwe bikujeê Lê tenê Ebdurihman bin MILCÊM dikare bi hilpesariya xwe rabe û ew Elî bin ebî TALIB dikujeî lê rê nakeve wî kuî ew bireve û şîa ELÎ wî dîl dikin; "piştî mirina Elî bin ebî TALIB bi lêdana hinek derb ji aliyê Ebdirhman bin MILCÊM veî Ebdelah bin CEIFER rabû Ibin MILCÊM anî û dest û lingên wî jêkirin û çavên wî jî korkirin – ew bi hesinê sorkirî kildan– û... fermana jêkirina zimanê wî jî da..." ,61.ê

ELMESÛDÎ jî li ser evê bûyerê radiwestê û yek ji xwendina çêroka wî têdighe kuî evên misliman çi kîn li ser hev hilgirtineî heya kuî ew karibin bi evê hovîtiyê bawermendekî weke Ibin MILCÊM bidin ber kuştinê; "... û dema xwestin Ibin MILCÊM... bikujinî Ebdulah bin CEIFER got: wî ji min re bihêlinî ta kuî dilê xwe hûnik bikimî wî dest û lingên wî jêkirin û mîxek germkirî ta ku bû kuzot û çavên wî pê kildan... û di dû re xelkê ew bir û di beyaran re xuşandin û di pişt re ew bi petrol şûştin û agir pêxistin" ,62.ê

2- KUŞTINA MIHEMED BIN EBÎ BEKIR:

Eger kuî mînaka yekemîn ewqasî di nav mislimanan de ne bi nav û dengeî lê mînaka me ya duyemînî kesekî nasdareî eger kuî ne ji aliyê xwe ve be jîî lê bi kêmanî ew lawê ewê yekemînbû kuî li pey MIHEMED çû û baweriya xwe bi ola nuh anî û ji aliyê din ve jîî ew birayê AÎŞE ye; dayîka bawermendan a herî zîz li ber dilê MIHEMED kuî hêştibû ew ji mislimanan bixweze; ew nîvê ayîneya xwe ji wê werbigrin û tevî evê yekê jîî dê nikaribe xwe ji ewê çarenûsa kuî qet yek nikare bawer bikeî bi parêze; "û di sala sî û heyştan de MUAWIYAî EMRO bin ELAAS bi ser MISIRÊ de şand... ew û Mihemed bin ebî BEKIR li hev rast hatin –ew kargêrê ELÎ bû– li cihekî jê re dibêjin MISNATî wan şer kir û MIHEMED dişke... ew şer dikin ta kuî MIHEMED têtе kuştin... wî dibin û dixin hundir eyarê kerekî û êgir pêdixin" ,63.ê

3- KUŞTINA OSMAN BIN EFAN:

Qet ne gereke kuî em li ser kesîtî û navdariya nimûneya xwe ya sêyemîn bi peyivin û bi xwendevanan bidin nasînî ew ji dijmin û ji berî dostan re kesekî xwedî nav û denge û ewî bi hebûn û sermiyandariya xweî roleke pir girîngî di destpêka mislimantiyê de lîst û hêşt kuî MIHEMED bibe xwedî pişтê Lê tevî evan nihad û karên wî û salên wî yên di heyştê de jîî dê nikaribin wî ji ber kuştinê bidin alî û "eger ku Omer bin XETAB bi destê xortekî Mecosî hat kuştin û êşek di dilê mislimanan de hîşt" ,64.ê Lê Elî bin ebî TALIB û Osman bin EIFAN bi destên hevlên MIHEMED bi xwe hatin kuştin û çi kuştinê

Weke ku dayîkên pirtûkan ji me re salix didin kuî di roja înê 8 zî elhice sal 35 Kê 17 yonyo sal 656 Zê cemawerekî mezin ji mislimanan derdora mala cîgirê sêyemîn girêdan û jê xwestin dev ji cîgiriyê berde yan jî dê wî bikujinî "hinek hevalên MIHEMED û lawên xwe bi şorişgeran re civînî ewên derdora mala Osman bin EIFAN

girêdan** û ew kuştinî di nav wan de Mihemed bin ebî BEKIR... û ji yên ku xelk li ser evê çêrokê dihevotî Telhe bin UBEYDULAH û AÎŞE dayîka bawermendan û xeynî wan" ,65.ê Helbet ev yeka jî piştî nakokiyin dûdirêj hatibû û ew ne mijara me yeê

Lê gotina Osman bin EFAN a hertim ji wan re kuî "kirasê XWEDÊ lêkiriye ti kesî ji bilî wîî nikare jê bike" û wilo pir şandek di navbera cemawerê serî hildayî û cîgir de çûn û hatinî lê bêyî kuî ew bighên ti çareseriyan û wilo wan êrîşî ser deriyê kilît kirî kirin û agir pêxistin û hinek jî di ser dîwarên cîrana re ketin hundir; "Mihemed bin ebî BEKIR di ser dîwarê mala Emro bin HEZIM re ket cem OSMÊN û digel wî jî Bişir bin UTAB û Sodan bin HEMRAN û Emro bin ELHEMIQê Wan OSMAN li ba pîreka wî NAÎLE dîtin kuî ewî di pirtûkê de sûretê Elbeqera dixwîneî Mihemed bin ebî BEKIR ket pêşiya wan û bi rihên OSMÊN girt û got: XWEDÊ dest ji te berda ey NEISELî -hinekan ev nav li Osman bin EFAN kiribûn û pireka ji wan û bi rengekî fêrmî bang li kuştina wî dikirin-; û gihîşt ku aşkere bang li kuştina wî bikinê Li ser zimanê AÎŞE tê gotin: NEISEL bikujinî neileta XWEDÊ li NEISEL*** be" ,66.ê Û vaye "Ebdirhman bin OIF jîî li ser doşeka mirinêî ji hin hevalên xwe re dibêje: Wî bikujin ji berî ku zordariya wî bêtir dibe" ,67.ê

Û piştî ku ew çedikin ber hev û Mihemed lawê ebo BEKIR tûkên wî dide ber çavan û jê re dibêje: ka çima MUAWIYA û xeynî wî nayên alîkariya te û hîne wî riyê OSMÊN bernedaneî ew jê re dibêje: "lawê birayê min rihê min berdeî bavê te dê ti caran wilo nekira"î lê MIHEMED vedigerîne û dibêje: "tiştê ku em dixwezin bi te bikin ji evê yekê bi pirî mezintire û... bi tîrekî ku di dest wî de bû eniya wî diqelêşe û Kînana bin Bişir bin ÎTAB destê kuî ji nişkava hinek tîr têde dîtibûnî radike û li bin guhê OSMÊN dide û wan têvedideî ta kuî di gewriya wî re

çedike û di piş re şûrê xwe hiltîne û wî dikujeê Û dibêjin: Kînana bin BIŞIR bi bastûnekî li eniya wî da û ew bi aliyekî de qulabt û di dû re Sodan bin Hemran ELMIRADÎ ew bi şûr kuştê Hema Eimro bin ELHEMIQ jî hulpekî ser sîngê wîî û hîne hinek nefes di wî de ma bûî û neh derb lêdan û got: Sisê ji wan min ji bo XWEDÊ lêdanî hema şeşên din min ji bo tiştên kuî di sîngê min deî li ser wî" ,68.ê

Û dibêjin dema wan bi tîr û şûran li wî didaî wî hîne Quran dixwend û evê yekê hêşt ku pirtûk di xwînê de bimîne û hinekan jî xwest seriyê wî jêkinî lê hinekên din rê nedaî nemaze piştî ku NAÎLA xwe avête ser cendekê wîî lê dîsan jî nikarî rê li ber Uimeyr bin DABI bigre kuî hilnepeke ser sîngê wî û hin parswên wî neşkîne tevî kuî ew miriye jî û bi derketina xwe re ti tiştî li hundirê wî nahêlinî tevî rêşdikin û dibinî ta bighe xeftanê NAÎLE û pîrekên din û hinek jî gotin û destan davêjin wanî ji bilî kuştina çend kole û xizmekarên mala OSMÊN... û wilo perde bi ser çêrokeke din ji yên mislimanan tête berdanê (ji bo ku xwendevan bi ferehî li ser evê mijarê rawesteî em wî vedigerînin pirtûka "Zî Elnoreyn Osman bin EFAN"î ji rûpelê 187 ta rûpelê 224 an)ê Û rojek dê were kuî kurê Osman bin EFAN û li ser destê cîgirekî mislimanan; Ebî Ceifer ELMENSÛR hezar qayîşî buxeê

ÊŞKENCEKIRINA ZANYARAN:

Carina ev pirs ji rewşnbîrê Ereb tête kirin; çima dengê wî li ber destlatan nizime û ew weke rewşenbîrên miletên din nikare li hember evê destlatiya kor raweste û bihêle weke kuî li ser rojnamegeriyê tête gotin kuî ew destlatiya çaran eî ew rola xwe bistîne û evan serok û fermandaran tazî bike û bihêle miletê Ereb li hember wan û nîrên wan rabeê Belêî em pir caran evê pisê di ragihandinên erebî de dibhîsinî lê li gor dîtinên me hîne bersivên rasteqîn nehatine dayîn û ew jî

bûyerên çûne û yên bên de bibîninê

Milet û imperetoriyekî "şaristaniyek" weke ya mislimantiyê kuî ji pêşî deî li ser tirs û xwînê rabeî dê helbet çand û kesîtiyeke revok weke ya "me" peyda bikeê Weke me dît ewana ne tenê "ewê din" dane ber kuştin û talanêî lê heya heval û hogir jîê Û wan bi ewê yekê tenê nekirine jîî lê heya zanyarên xwe jî dûrî evê cergeya tirsê nehêştine û bi sedan çêrok û bûyerên êşkencekirin û kuştiyariyêî ewên di dermafê zanyaran deî ji me re hîştine; "OSMAN li Ebdulah bin MESÛDî hevalê bi rûmetî xist ta ku ew fitiqî kir û hêşt têkeve nivîna mirinê û mir û Ebo Zir ELXEFARÎ... jî ji Midînê koçkir û hêşt li beyabaneke rût; Elrebze ji tî û birçîbûna reî bimre" ,69.ê

Helbet ne tenê OSMANî di evê çêrokê de gunehkare; "Elzubêr bin ELEWAM... li hember ELÎî di bûyera Elcemel deî şer kir û gava ji cengê direve Omer bin CERMOZ rastî wî têî seriyê wî jê dike û ji pêşew ELÎ re tîne (Sê) di sala 36 a koçî de" ,70.ê "Û MÛTESÊM jî sî û heyşt xizêranan li Ehmed bin HENBEL dideî da kuî bêje Quran çêkiriye" ,71.ê Û yekî din; ELXERCÎ ku ji nivîskarên bilind bûî dê di jiyana xwe de şeş hezar sîle ji cîgirekî pûşt weke ELMITEWEKÊL buxeê (vegere Miroc Elzehebî Cê 4î Rê 102)ê Û êşkenciya ELMENSÛR ji Ebî HENÎFE re û zindankirina wî û lêdana ji wî re û li dawiyê pê vexwerdina jehrê... û lêdana ELMENSÛR ji MALÊK re û ew tazî bêyî kuî ti tişt şermîniyên wî veşêrinî da kuî wî riswa bike" ,72.ê

Lê ev bûyer tev li aliyekî ne û bêtara ku Ibin ELMUQEFEI pê hatiye kuştin li aliyekî dine û ji bo sedemekê kuî dihêle rewşenbîrên Ereb qet newêribe yek gotinê li ber destlatên xwe bêje û ev çêrokî digel ên çûne û bi şêweyeke beloq bersiva newêrekiya rewşenbîrên Ereb dide; "û... Ibin ELMUQEFEI jî pirtûkeke biçûkî lê bi sûdeyeke pir mezin û bi navê "Rîsalit Elsehabe" ji MENSÛR re şandî

têde temiyan li cîgir dike kuî çawa alîkar û berdestên xwe vebjêre û bi konevaniyeke duristî bi cemawer reî bide û bistîne û ew di temiyên xwe de pir bi zimanekî nerim û diltenik axivî bû û ne dûre kuî dayîna xelat û hin pereyan ji MENSÛR tika dikirî û belkî qet bawer ne dikir kuî tenê dayîna hin temiyanî gunehekî mezine li ba ELMENSÛR û... seza ewê kuî rola xwe derbas bikeî dê weke ya Ibin ELMUQEFEI beî ewê kuî dest û lingên wîî parî bi parîî jêkirin û li ber çavên wî li ser êgir bijartin û bi zorê hêştin ewî parî bi parîî buxe ta ku... dimre û ne dûreî û ewî laşê xwe bi fermana mîrê bawermendan duxeî ku pirsî be; çi mîr û çi bawermend" ,73.ê

Û ne dûre ku pirsî beî çi bawermendî û çi mislimantî û çi surûş û... ta çi XWEDÊ jîî vêca em jî dipirsin û piştî evê bûyerêî dê ti kes wêribe li ber cîgir û destlatan dengê xwe bilind bike û ji wan re bêje: naê Eger kuî hinekên din ên serhişk hebin jîî dê çarenûsa wan ji ya Ibin ELMUQEFEI ne çêtir be; "... û li ser ELWASÊQ jî tê gotin kuî wî Ehmed bin Nesir ELXUZAÎIî yek ji mezintirîn gotûbêjên gotinanî di dîroka Îslamê deî ku di bendan de girêdayî (û) ji Bexdayê anî Samura û li ser Quranê jê pirsîî wî got: ne çêkiriye... hêşt hêrsê ELWASÊQ rabe û şûr xwest û got: Eger ku ez rabûm kes bi min re ranebin... derbek li kepira wî da û ferman daî ku seriyê wî vegerînin Bexdayê û li wir bi dar vekirin û laşê wî jî li Samuraî ta şeş salan xaçkirî ma" ,74.ê

Emê bi çêroka kuştina Ibin ELMUQEFEI dawiyê li evê movikê bîninî ne ku di dest me de ji bilî wan tineneî lê ji ber ku emî ji aliyekî veî naxwazin pir dirêj bikin û ji aliyê din de jîî ev bûyerên ku me anîne zimênî wêneyeke sayî dane xwendevan kuî çanda mislimantiyê ta çiqwasî di pêvajoya tirs û xwînê de çûye; "li vir emê rawestin... lê tenê bese kuî çavên sê cîgirênî di pevdemekê deî hatin korkirin û perçiqandin û ew jîî ELQAHÊR û ELMUTEQÎ û

ELMUSTEKFÎ” ,75.ê

KUŞTINA DÎLAN Û LÎSTINA BI CENDEKAN:

Weke em dizanin kuî di hemû deman deî hinek mafên dîlan hebûn û heya çiqwasî dijmantî heba jîî ewana rûmeta dîlan digirtin û ev yeka sinc û pêgirteke civakî bû û rêzgirtina ewêî di navbera şerkaran deî dihate girtinê Lê heya ev jîî li ba mislimananî ne hatiye rêzgirtin û ji aliyê nimûneyê wan ê herî pêşî MIHEMED bi xwe; “Nedir bin HARÊS tête kuştinî Elî bin ebî TALIB wî dikujeê Û ji wir derketî ta gihêşt Eirq Elzebiyeî wî Eiqbe bin ebî MEÎT kuşt û gava EIQBE ji pêximberê XWEDÊ (Sê)î demê ku ew fermana kuştina wî dideî dipirse: MIHEMED kiyê ji zaroyan re bimîneÛ Ew dibêje: agir...” ,76.ê Ango dilovniya wî; “pêximber” ji zaroyan re jî nîneê

Li aliyê din û piştî ku misliman dibin du kêşeyên rikbirî ev çanda han û sinca kuştina dîlan bi rengekî bernameyî tête bi karanîn; “û ELMUXTAR bang kir... û rê li pêş şîa vebû kuî ewên ELHUSÊN kuştine bikujin û di pêşî de dest bi kuştina dîlan bû û di dû re jî bi serekên kuî di ber Kerbela yê de berpirsiyarinî ew ji cihveşarên wan bi derxistin û kuştin...” ,77.ê Û “MUSIEB –bin ELZUBÊR– hemûyên kuî xwe dane destî kuştin û weke dibêjin; hejmara wan di navbera şeş û heyşt hezaran de bû... û wilo navê serbir kuî lêbûbû di cihê xwe de hat... lê tiştê kuî bêtir hêşt xeyd li ser MUSIEB çêbibeî kuştina wî ji jina ELMUXTAR re... û MUSIEB bi ser de jî ferman da û destê ELMUXTAR jêkirin û di rex mizgeftê de hate mîxkirin” ,78.ê

Û ji berî ku şerê ELCEMEL dest pê bike jîî hinek ji hevalên MIHEMEDî û di bin serkêşiya AÎŞE deî diçin BESRAî lê kargêrên ElÎ wan digrin û rihên wan jê dikin û dema ew dixwezin gencîneya mislimanan bidizin û parêzerên wê nahêlinî ew şer dikin û “heftê mêr tête kuştinî ji bilî birîndaranî û pêncî

ji ewan heftiyî pişti kuî ew hatibûn dîlkirinî hatin serjêkirin” ,79.ê

Dîl û ew di şer de hatiye girtin û belkî yek riyê ji xwe re bibîne û wî bikujeî lê hema tu rabî û şandekan jî bikujî; dema kuî Ebeydulah bin ZIYAD ji şandekê Elhusên bin ELÎ dixweze kuî li ser diyarokê sixêfan ji ELÎ û kurê wî ELHUSÊN re bide û ew ne tenê wilo nakeî lê bi ser de jî pesna wan dide û sixêfan ji wî û bavê wî re dibêjeî ew wî digre û tîne koçka xwe “û Ubeydulah bin ZIYAD fermanê dide kuî ew ji jorî koçka wî de bête avêtinî ew avêtinî ew hûr dibe û dimre” ,80.ê

Lê evana ne tenê rûmeta dîl û şandekan negirtiye û gihîştiye radeya kuî ew bi cendekê ewê mirî jî bilîzin; “Hind bint UTBE û jinên pêre gihêştin wir û dest bi lîstina bi cendekê hevalên pêximber (Sê) kirinî poz û guhan jêdikin; gihêşt ku HINDî ji poz û guhên mêranî gerden û xilxalan çêbike û... sîngê HEMZE diqelêşe û cîgerê wî dicû...” ,81.ê Û evê yekê hêşt ku MIHEMED bibêje: “eger ku XWEDA hêşt ez li deverekê ji deveran bi ser Qureyş kevimî ezê bi sî mêrî bilîzim” ,82.ê Angoî eger ku ew di şerekî xwe yê digel Qureyş bi ser bikeveî ewê bi cendekê sî mêrî ji ewên wan bilîze û ev ji me re dide nasîn kuî MIHEMED bi xwe jîî dûrî ewê sinciya ku rûmeta dîlan û cendekên kuştiyan digirteê

SERJÊKIRIN Û ÇANDA MISLIMANTIYÊ:

Weke di hemû çêrok û bûyerên kuî bi me re derbasbûneî me dît kuî sinc û pêgirta serjêkirinê li ba mislimanan karekî rojaneye û yek dikare bibêje kuî ew zaroyên xwe li ser ewê sinciyê perwerde dikin û em nikarin yek kêşeyê weke yeke awerte û dûrî evî karî bibînin; “... û wilo Ibin XUBAB birin ber avekê û ew û jina wî ya pêre serjêkirin û pir kes bi vê rengî kuştin” ,83.ê “... ketin pey Qitrî bin ELFUCAE ta kuî li Teberistanê gihêştin wîî

şer bi wî re kirin û... ji ser hespê xwe de kete devê geliyekî... û hinekan ew dît û kevirek bi ser wî de berdan... ew kuştin û Ebo Elcehim bin Kînane ELKELBÎ seriyê wî ji HECAC re dibe û di pişt re jî ji Ebdul Melêk bin MERWAN re tîne" ,84.ê

Û yek ji cîgirên kuî pir serî jêkirine Ebdulmelêk bin MERWAN e û kargêrê wî Elhecac bin Yosêf ELSEQEFÎ kuî li ser dema wan pirekan seriyên xwe wenda kirinî weke: Emro bin SEÎD û Ibrahîm ELEŞTER û Îsa bin MUSEB û dighêje kuî ELMESÛDÎ binivîse; "... ji Ebî Muslêm ELNEXEÎî wî got: Min dît ku seriyê ELHUSÊN anîn û li mala Elkofê di nav destên Ubeydelah bin ZIYAD e danînî û paşê min dît seriyê Ubeydelah bin ZIYAD anîn û li ewê cihî di nav destên ELMUXTAR de danîn û di piş re min dît seriyê ELMUXTAR anîn û di nav destên Museb bin ELZUBÊR de danîn û di dû re min dît seriyê Museb bin ELZUBÊR anîn û di nav destên EBDULMELÊK de danîn" ,85.ê Û ji bo firehkirina mijarêî xwendevan dikare vegere (Miroc Elzehebî cildê sêyemînî rûpelên ji 99 ta 117) eê Ne tenê wilo lê xweştirîn kêfxweşiya wan bi rijandina xûnê û serjêkirinê dihate cihê

PISÎKOLOJIYA KUJYARIYÊ:

Piştî evan çêrok û bûyeranî em dikarin çanda mislimantiyê weke çanda tirsê bi nav bikinî ewa ku mirovê misliman li ser derûn û pisîkolojiya kuştin û wêrankirinê perwerde dike û eger kuî yek li çêroka jiyana Busir bin ERTAT vegereî dê pisîkolojiya yê misliman nasbike: "Di salên çel û şeşan de MUAWIYEî Busir bin ERTAT digel sê hezar leşker bi ser Midînê de dişîne... û li ser diyarokêî wan bi kuştinê azar dikeî eger kuî ew MUAWIYE weke cîgir nepejirînin û... ji wir diçe Mekê û di dû re jî Yimenê û li wir Ubeydelah bin ELEBAS hebûî ew jê derdikeve û... herdu lawên xwe EBDURIHMAN û QESEM li ba diya wan Ciweyriye

bint Qariz ELKÎNANÎ dihêleî BUSIR wan û xalekî wan dikuje... û BUSIR li Midînê û di navbera herdu mizgeftan de pir xelkên ji Xuzaa û xeynî wan kuştibûnî û dîsa li Cirif pir xelk ji mêrên Hemedanê kuştibûnî û li Senaayê xelkin pir kuştibûnî wî bes dibhîst ku yek piştgirê ELÎ ye ew dikuşt" ,86.ê

Belêî eger kuî tenê em li çêroka jiyana Busir bin ERTAT vegerin û binirinî ka ew çawa mirî emê pisîkolociya mislimanan nasbikinê "... kalemêr li dawiyê dixerife û mêjiyê xwe winda dike û ew bi şûr tête nasînî wîî ji xwe bi dûr nedixistî jê re şûrekî textî çêkirin û eyarek (meşkeke eyarî) jê re werimandinî wî lêdida û her kuî ew diqetiya bi yeke nuh diguhartinê Wî bi ewî şûrî li ewê meşkê dida ta kuî ji binî mejiyê xwe wenda kir û gûyê xwe dixwar ..." ,87.ê Hezkirin û pêvegirêdana BUSIR bi ewî şûrî ve derûn û kesîtiya yê misliman ji me re aşkere dike kuî ev çanda mislimantiyê çiqwasî yekî ber bi xwînê têve dide û ev bi xwe jî ji me re şirove dike kuî çima ev hêzên teror tev bi Ola Mislimantiyê ve girêdayîne û em îro karên wan dibîninê

ŞÊWEYÊN KUŞTIN Û ÊŞKENCIYÊ:

Eger ku tenê em li rê û şêweyên kuî mirov pê dihatin kuştin vegerinî emê nasbikin ku ev çand; çanda mislimantiyê li ser çi ava bûye û çi dihêle ew di roja îro de û bê pirs û dadkirin "ewê din" bidin kuştin û bi evan riyên hovaneê Û em li jêr hinek rê û şêweyên kuî wan û heya nuha jî bi kar tîninî bînin zimên:

45-Kuştina bi derbên şûr û xenceranî ev rê jî di şer û cengan de bi kar têteê

46-Serjêkirina bi şûr û ev a bêtir bi kar têê

47-Guvaştina gunên mirov ta ew dimreê

48-Xistina mirov navbera du darî textan û guvaştina wîî ta ku ew tête pelixandinê

49-Bihingirtina yekî; çi bi danîna destan ser devê wî yan jî

bi riya balîv û cilikanê

50- Derzîkirina bi ava gerim; kuştina cîgir ELMUITEZê

51- Werimandina bi berdana bê di damaran re û kêrkirina wan da kuî xwînê bi xortî birjîneê

52- Xistina jehrê hundir xarinê; kuştina Hesen lawê ELÎê

53- Lêdana bi çov û xizêranan ta ew dimre; kuştina Beşar bin BURDê

54- Jêkirin û hûrkirina mirov û hilkirina regezên wî yek bi yekê

55- Xistina mirov hundir laşeyekî gemirîî ta ku kurimên ewî laşî bere wî jî bikinê

56- Bijartina mirovî weke dewarekêî li ser êgirê

57- Xistina mirov li ser seriyê wî hundir kortekê de da kuî "canê wî di paşiya wî re derkeve"ê

58- Girêdana yekî li ser koşka mîr û berdana tîran ser wî ta ew têtе kuştinê

59- Avêtina yekî û ew hîna nemiriye ji ser koşka mîr deê

60- Hêştina yekî tî û birçî di hundirê zindanan de û hilweşandina dîwaran bi ser wan deê

61- Xistina yekî hundir sindoq û metmûran de; mîna bi Elewiyan dikirinê

62- Xazûqkirin; xistina dar an jî hesinekî di paşiya wî de û derxistina di dêv reê

63- Gurandina mirov weke qurbanan û jêkirina koştê wîê

64- Nehêştina ewê dîl û girtî kuî razeê

65- Korkirin û kildana çavan bi şîşeke sorkirî bi êgirê

66- Bi darvekirin û xaçkirina "ewê din"î piştî serjêkirinêê

GOTINA DAWÎ:

Li dawiya evê vekolîna xweî em dixwezin hinek pirs derxînin holê; geloî evê ku li ser çandeke wilo hatiye perwerdekirin û hêştiye ew ji sîka xwe bitirseî dê wêribe li pêş evan rêjîman derkeve û serî hilde; ango dê hêz li ba wî hebe kuî hinek guhertin derbasî hundir civaka misilimantiyê bike û rê li pêş evan hêzên teror û pêla

kevneşop bibireê

Piştî me dît kuî çiqwas bêtar û komkujî bi navê evî XWEDA yî hatine li darxistinî gelo ka pêdiviyên me bi yekî wilo dê çibin û ka ev mislimanên kuî bang li hişmendiyê dikin ewê karibin xwe ji şûnmayiya Îslamê rizgar bike û wan çêrokan weke efsaneyên bapîran bixûnin û ne weke rasteqînên jiyanê yên "pîroz"ê

Ev cemawerê bawermendî dê çawa karibin piştî hezar û çarsed sal û wilo bi hêsanîî dev ji XWEDA û çêrokên wî berdin û ka çi derfet dê ji evan pêlên misliman ên nîv-nîv re hebin kuî nehêlibin ev cemawerî pariyekî hêsane beî ji pêlên kevneşop re û ew karibin li şûna YEHO yê Tewratê; ew Xwedayê şer û cenganî Xwedayekî dilovanî yekî bê kîn û kuştin û dojeh bidin afrandinê

Pirseke din xwe bi hêz derdixe pêş her ewê kuî li ser dîroka dewleta Îslamî radiweste; gelo ka "Pêximber"î di pêşî deî xwedî pirojeyeke şaristanî bû û ew piştî xwendin û têgihêştineke kûrî ji hemû kartêkirên serkeftina şoreşekê reî gihêştibû ewê baweriyê kuî dem gihêştiye û gereke ew ji aboriya êlî derbasî ya bajarvaniyê bibinî an ew weke xwedî xwenerojekanî ji ewan pêrûtanî ku dixwestin hinek dadvanî di civakeke nifşî de pêk bîninê Û pirs li ba yekî kom dibinî lê em di ewê baweriyê de ne kuî bersiva evan pirs û pirsgirêkan û çareserkirina piroblêmên meî tenê di yasan û qanûna kuî dihêle ol û dewlet ji hevdu cuda bibin de ye û weke em dibîninî dem hatiye kuî hêzên pêşverû û komeleyên civaka sivîl bilivinî da kuî em karibin bingeha civakeke bê kuştin û zordarî bidin damezrandinê

.....

Gîre:

135- Riyad Elsalihînî Rê 320ê

136- Ellah wel Însanî Rê

31ê

137- Qis û Nebîî Rê 164ê

138- Dîn Elînsanî Rê 91ê

139- Miroc Elzeheb Cê 1î Rê 36ê

140- Miroc Elzeheb Cê 1î Rê 67ê

141- Quses Elquranî Rê 302ê

142- Pirtûka Quranê

143- jêdera berê

144- “ “

145- Pirtûka Enecîlan

146- Jêdera berêê

147- Miroc Elzehebî Cê 1î Rê 202ê

148- Telbîs Iblîsî Rê 102û106ê

149- Tehzîb Sîrit bin Hîşamî Rê 198û207ê

150- Tehzîb Sîrit bin Hîşamî Rê 212ê

151- Zî Elnoreyinî Osman bin EFANî Rê 94ê

152- jêderê berêî Rê 96ê

153- Miroc Elzehebî Cê 4î Rê 60ê

154- Muitemer Ulemai BEXDADî Rê 113ê

155- jêderê berêî Rê 114ê

156- jêderê berêî Rê 114ê

157- Elheqîqa Elxaîbeî Rê 87ê

158- Elşîe beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 89ê

159- Miroc Elzehebî Cê 2î Rê 375ê

160- Elşîe beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 57ê

161- Mê Uê BEXDADî Rê 134

162- Elşîe beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 34û35ê

163- Fê FODÊî Rê 96ê

164- Elxewarêc Welşîaî Rê 261ê

165- Elxewarêc Welşîaî Rê 260ê

166- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 218û219ê

167- Elxewarêc Welşîaî Rê 175û177ê

168- Miroc Elzehebî Rê 380ê

169- “ “ Rê 404ê

170- Elşîe beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 205û208ê

171- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 69ê

172- Elxewarêc welşîaî Rê 194û195ê

173- Eşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 90ê
174- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 70û71ê
175- jêderê berêî Cê 3î Rê 304ê
176- " " î Cê 3î Rê 310ê
177- Elxewarêc Welşîaî Rê 41ê
178- " " Rê 42ê
179- jêderê berêî Rê 57û59ê
180- Mê Uê Bexdadî Rê 123û124ê
181- Eheqîqa Elxaîbeî Rê 80ê
182- Elşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 89û90ê
183- Mê Uê Bexdadî Rê 92ê
184- Elşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 104ê
185- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 134ê
186- Elşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 90ê
187- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 132ê
188- jêderê berêî Rê 175ê
189- Elheqîqa Elxaîbeî Rê 95ê
190- " " Rê 98ê
191- " " Rê 103ê
192- Elşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 199û200ê
193- Miroc Elzehebî Cê 4î Rê 209ê
194- Elşîa beyn Elheqaêq Welewhamî Rê 90û91ê
195- Elheqîqa Elxaîbeî Rê 68ê
196- Miroc Elzehebî Cê 2î Rê 426ê
197- " " î Cê 2î Rê 420ê
198- Elheqîqa Elxaîbeî Rê 25ê
199- Muitemer Uilemai Baxdadî Rê 74ê
200- Elheqîqa Elxaîbeî Rê 24ê
201- " " î Rê 41ê
68- Zî Elnoreyin Osman bin EFANî Rê 187û194ê
69- Mê Uê BAXDADî Rê 77û78ê
70- Mê Uê BEXDADî Rê 85ê

71- Miroc Elzehebî Cê 4î Rê 52ê

72- Elheqîqa Elxaîbeî Rê 107ê

73- “ “ î Rê 108ê

74- “ “ î Rê 127ê

75- “ “ î Rê 132ê

76- Tehzîb Sîrit bin Hîşamî Rê 149ê

77- Elxewarêc Welşîaî Rê 222ê

78- Elxewarêc Welşîaî Rê 231ê

79- Miroc Elzehebî Cê 2î Rê 367ê

80- Elxewarêc Welşîaî Rê 170ê

81- Tehzîb Sîrit Ibin HÎŞAMî Rê 166û167ê

82- jêderê berêî Rê 168ê

83- Elxewarêc Welşîaî Rê 40ê

84- Elxewarêc Welşîaî Rê 108)ê

85- Miroc Elzehebî Cê3î Rê117ê

86- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 30ê

87- Miroc Elzehebî Cê 3î Rê 172ê

.....

:

31- الإمام أبي زكريا يحيى بن شرف النووي الدمشقي، رياض .

32- كارين آرمسترونغ، الله و الإنسان، دار الحصاد للنشر و – الطبعة الأولى، دمشق 1996 .

33- فراس السواح، دين الإنسان، منشورات دار علاء الدين – الطبعة الأولى، دمشق 1994 .

34- أبي الحسن علي بن الحسين بن علي المسعودي، مروج الذهب ومعادن الجوهر، دار المعرفة – .

35- أبو موسى الحريري، قس و نبي – بحث في نشأة الإسلام 1997 .

36- محمد أحمد جاد المولى، قصص القرآن، دار القلم العربي بحلب – 1993 .

37- كتاب القرآن، مكتبة الملاح – 1960 .

38- – ، 1988 .

39- الإمام أبي الفرج عبد الرحمن بن الجوزي القرشي البغدادي، نقد العلم والعلماء أو تلبيس إبليس، عني بنشره و قدم له و خرج أحاديثه محمود مهدي أستانبولي، دم 1976 .

40- عبد السلام هارون، تهذيب سيرة ابن هشام، الطبعة الثامنة – 1981 .

41- محمد رضا، ذي النورين عثمان بن عفان، الخليفة الثالثة، دار – الطبعة الثانية، بيروت 1982 .

42- شبل الدولة مقاتل بن عطية الحجازي، مؤتمر علماء بغداد، لجنة – الطبعة الثانية، الكويت 2003 .

43- فرج فودة، الحقيقة الغائبة، الهيئة المصرية العامة للكتاب . 1992 .

44- محسن الأمين، الشيعة بين الحقائق و الأوهام، منشورات – الطبعة الثالثة، بيروت 1977 .

يوليوس فلهوزن، الخوارج و الشيعة، ترجمة: رحمن بدوي، – 1958 .

Têkeliyên Kurd û ereb Sûrî Wek Nimûne

Korê Berêz Xeyredîn murad

Mesûd Barzanî piştgirîyeke mezine miletê me li Kurdistsna Sûrîyayê

Di semînareke sîyasî de bi navnîşana (Tûkelîyê kurd û Ereb، Sûrîya weke nimûne) berêz xeyredîn murad sikirtêrê gi:tî ya partîya azadî ya kurd li sêrîyayê، li Hewlêrê berêz gelek xalên sîyasî ronkirin.

Ev roj îawer;emê li katijamêr 6ê30 bi be ;darîyeke ji rew;enbîr،sîyasetmedar، rojnamevan û camewr lib axîa kombenda kawa ya re;enbîrî Ê li dirêjahîya îalakîyên kombendê yên îandî û sîyasî،semînarek bi navê (Têkelîyê kurd û Ereb، sûrîya weke nimûne) ji alîyê berêz Xeyredîn murad sikirtêrê gîştî ya partîya azadî ya kurd li sûrîyayê ve hate pêşkêşkirin، li dirêjahîya seminarê berêz xeyradîn ronahî da li sar gelek xalên girîng li rojavayî Kurdistan û herweha têkelîyê kurdan û Ereban li sûrîyayê، di axaftina xwe de jibo têkelîyên tevgera kurdî li gel deselata sûrî berêz murad weha got: "Tevgera sîyasî ya kurdî gelek pêkol kirine، daku dikaribe têkelîyan di nêvbera xwe û deselata sêrî de bike jibo dîdareke sîyasî pêk bînin، yekî ta niha deselatê bi ti awayê rê nedaye jî bo neÎarbÊn ku xebata xwe ya aşt"yane û demokratî bikin di riya şêweyê pirotistoyê re dest pê bike û xurt bike، di van çend salên dawî de jî kurdan neîarbûn bi awayeke rastîyane xebata xwe bikin û çalakîyên xwe bêtir bikin"

Berêz nîşan di li ser

pêşveçûnên rewşa sîyasiya kurdî li sûrîyayê û bandorên pozîtîvî û got: "Ev guhartinên nêvdewletî û herêmî û herweha rew:a pozotîv li kurdistana "raqê peydabûya û pêkanîna demokratîyê li "raqê bi giştî. ev bi giştî nûrmale ku bandorên wê pozotî li ser xebata gelê kurd li kurdistana sûrîyayê de hebe."

herweha got: hilbijartina serok mesûd barzani ji piştgirîyeke mezine ji bo milletê me li kurdistana sûrîyayê û bawarîya wan jî bi hêztir dike ji bo xebatê"

Berêz gotinên xwe berdewam kirin û sebaret bi têkelîy

ên kurdî û Erebî li gel opozesyona sûrî weha axivî : "Di despêka têkelîyên me li gel

Opezisyona sûrî me çalakyên baş bi hev re kirin wake xwepşandanên şamê û hevditnên berdewam û di 17ê çele 2005 a me rêkeftinek sîyasî bi hev re navişkir. ji xalan pêkhat ji wan xala du sebaret bi doza kurdî bûn... mixabin weku xuyayê alîyê demokratî ba biraderên me yên Ereb ne gelkî girînge qasî nerînên wan yên netewayetî bilinde û alîyê :ovînî Jî girîngtire ji demokratîyê... niha jî têkelîyên me û Ereban bi rastî hatine hejandin emê her berdewam bin bo vekirina têkelîyan li ser bingeheke demokratîk"

Berêz Xeyredîn Murad nîşan da ser mafên gelê kurd yên Niştimanî li sÊrîyayê û hereha mafên Netewî û taybetmendîyên wê û got: "herweha em weke kurd û xelkên din di civaka sûrîyayê de bi hev re hevpişkin û em têkelîyên xwe yên niştimanî di hundir sûrîyayê de têk nadin. lê em ji bîr nakin jî ku em netewekin û taybetmendîyên me yên milî hene û mafên me yên netewî hene û herweha em bebşekin ji kurdistsns ku di nêvbera çar dewletan de hatîye parvekirin ji ber vê du erkên me hene. yek ji alîyê netewî û yê din ji alîyê niştimanî"

Jibo berdewamîya têkelîyên kurdî-kurdî û kurdî- Erebî berêz weha got: "Me komîteyek hevbeş li ser asta sekirtêrên partîyan avakirîye jibo rçvebirina karê rojane û ev komît ji partîyên Hevbendî û Bera democrat li Sûrîyayê pêk tê û ez bawerim berî sê rojan civînek wan hebû û di encamp pêde xalek di daxuyanê de hatibû ku bêtir bikaribin têkelîyan xwe bi alîyên Ereb re bi hêztir bikin"